



ARTICLES

Di Çarçoveya Bîra Civakî Ya Kurdan De Têkiliya Bûyerên
Dîroka Nêzik û Kilamên Dengbêjan

*In the framework of the memory of the Kurdish community
Dengbêjs' songs about the recent events*

Tekin Çiftçi

A Survey on Loanwords from English to Kurdish

Rebin Abdulqader Azeez , Hawkar Akram Awla

Kürtçe İsim Tamlamasının Yapısı

Jan Strunk [Cev.: Hasan Karacan , M. Veysi Babayıgit]

Di Çarçoveya Teoriya Performansê De Nirxandina Vegotinêñ
Gelêri

*An Evaluation of Folk-narratives in the Frame of Performance
Theory*

Necat Keskin

NOTES & COMMENTS

Курды Казахстана и Средней Азии

Kurds of Kazakhstan and Central Asia

Knyaz Ibrahim Mirzoev

Pirsgrîkêñ Beşa Ziman û Edebiyata Kurdi di Zanîngehêñ
Tirkiyeyê de

*The Problems of Kurdish Language and Literature Departments
in Turkey*

Nesim Sönmez

BOOK REVIEWS

Keda Çewres Serran û Yew Kedkaro Bêhempa: M. Malmisanij û
Kitabê ci "Kurmançca ile Karşılaştırmalı Kırmançca (Zazaca)
Dilbilgisi"

Ahmet Kirkan

Ottoman Belgelerinde Kürtleri Aramak

Mesut Arslan

Vol. 2 Issue 1 (January 2016)

CONTENTS

	<i>Page</i>
Di Çarçoveya Bîra Civakî Ya Kurdan De Têkiliya Bûyerên Dîroka Nêzîk û Kilamên Dengbêjan <i>In the framework of the memory of the Kurdish community Dengbêjs' songs about the recent events</i> <i>Tekin Çifçi</i>	1
A Survey on Loanwords from English to Kurdish <i>Rebin Abdulqader Azeez , Hawkar Akram Awla</i>	11
Kürtçe İsim Tamlamasının Yapısı <i>Jan Strunk [Çev.: Hasan Karacan , M. Veysi Babayıgit]</i>	29
Di Çarçoveya Teoriya Performansê De Nirxandina Vegotinê Gelêri <i>An Evaluation of Folk-narratives in the Frame of Performance Theory</i> Necat Keskin	51
Курды Казахстана и Средней Азии <i>Kurds of Kazakhstan and Central Asia</i> <i>Knyaz Ibrahim Mirzoev</i>	67
Pirsgirêkên Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî di Zanîngehêن Tirkiyeyê de <i>The Problems of Kurdish Language and Literature Departments in Turkey</i> <i>Nesim Sönmez</i>	96
Book Review: Keda Çewres Serran û Yew Kedkaro Bêhempa: M. Malmîsanij û Kitabê ci “Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi” <i>Ahmet Kirkân</i>	105
Book Review: Osmanlı Belgelerinde Kürtlere Aramak <i>Mesut Arslan</i>	109



Di Çarçoveya Bîra Civakî Ya Kurdan De Têkiliya Bûyerên Dîroka Nêzîk û Kilamên Dengbêjan

In the framework of the memory of the Kurdish community Dengbêjs' songs about the recent events

Tekin Çifçi ¹

Received: November 06, 2015

Accepted: December 12, 2015

Kurte

Çanda devkî aliye kî bîra civakan e. Bi taybetî ji di civakênu ku nivîs bi têra xwe pêş neketiye de vegûhestina çandî piranî bi rîbaza devkî pêk tê. Ev pevbestiya devkî bi demê re diguhere wêjeya devkî û muzikê. Di çanda kurdan de jî barkêşen sereke yên vê çandê dengbêj in. Bikarneanîna zimanê kurdi ya bi awayekî fermî ji bo pêşketina dîroka nivîskî ya kurdan bûye astengekê, lê li aliyê din dengbêjên kurdan ji bo ku ev bûyer û qewimînên dîrokî ji bîra civakê neçin, her yej jin wan kirine mijara kilaman û vî rengî bîreke civakî ava kirine. Li her deverê Kurdistanê kilamên bi vî rengî hene. Her yek ji wan mijara lêkolîneke serbixwe ye. Dengbêj bi vê peywira xwe veguhestina dîrok û bîra kurdi ya bi rîya muzikê pêk tînin. Bi taybetî ji kilamên şinê gencîneyeke qirase ya muzikê saz bûye. Dengbêj bi strandina van kilaman bûne barkêş û berdevkên dîroka nêzik ya civaka kurdi. Di vê xebatê te du kilamên kurdi tevî çîrokên wan û dîroka wan wekî mînak hatine dayîn. Armanca vê xebatê ew e ku wate û girîngîya muzîka kurdi ya dengbêjiyê ya di bîra çandî ya kurdan de ji aliyê dîrokê ve bê niqaşkirin. Di beşa dawî de jî bi kurt û kurmancî li xebatêni pişâftina muzîka kurdi hatiye sekinin.

Miftepeyv: Çanda Devkî, Dengbêj, Bûyer, Kilam, Dîrok

Abstract

Oral culture constitutes an aspect of social memory. Especially in the societies where written culture has not developed enough, cultural transmission comes true in an oral way. This oral attitude transforms into music and oral literature over the time. In the Kurdish music, Dengbejs are the primary transmitters of this oral culture. As Kurdish has not been used as a formal language for a long time, it has prevented Kurdish history to be transferred in written form. On the other hand Kurdish dengbejs, in order not to let historical events to be erased from the social memory, they've made these events up by making each of them a subject of their kilams and in that way built the social memory. In every corner of Kurdistan it's possible to come across to this kind of songs. Each of these can be a subject to a research individually. Dengbejs, with the songs they made, have taken the role to transmit the social consciousness. Particularly from the mournings there have emerged a giant archive. This study aims to make a debate on the importance of music in the Kurdish oral culture in terms of history. In the study, music and history relationship will be discussed in the lights of two different songs which express two different events happened in our recent history. And in the last section, the efforts to assimilate Dersim's history and music will be addressed briefly.

Keywords: Oral Culture, Dengbêj, Event, Song, History, Assimilation

Recommended citation:

Ciftci, T. (2016). Di çarçoveya bîra civakî ya kurdan de têkiliya bûyerên dîroka nêzîk û kilamên dengbêjan [In the framework of the memory of the Kurdish community Dengbêjs' songs about the recent events]. International Journal of Kurdish Studies 2 (1), pp.1 – 10.

¹ Corresponding Author: Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstitûya Zanistên Civakî Makezanista Dîrokê Bernameya Doktorayê (Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı Doktora Programı) E-mail: tekincifci02@gmail.com

FOLKLOR Û DÎROK

Zanîna derbarê hemû çalakiyên mirovan de tenê bi şopandina bermayıyên wan çêdibe. Ev bermayî ci kevirek be, ci peyveke ku çandê nîşan dide be, ferq nake. Lewma jî hêza mezin, pergala serdest, dema ku bixwaze civakekê ji hişmendiya netewî û çandî bêpar bihêle, serî li rîbaza danjibîrkirina bi pergal û dûvdirej dide (Connerton, 1998). Anglo karê xwe bi zanetî û planên demdirêj dimeşîne. Wisa dike ku gelek mirov bi pêvajoyê jî nahisin. Lê ew plan her carê bi ser nakeve. Vegotina serpêhatiyan, du tiştên girîng bi hev re çê dike. Yek jê, liv û tevgera kesên ku qala wan dibe, ya din jî bi vegotina serpêhatiyê re eşkerekirina rewş û dema bûyerê ye (Connerton, 1998) Li gor Halbwachs, kes serpêhatiyên xwe bi riya endamtiya civakê, merivanî, bawerî û têkiliyên çînî bi bîr tînin. Dema ku em serî li bîra civakê didin, rewş û dema bûyerê bi civaka wê demê re têbîra me.

Yek ji navgînên domandina folklorê, bîra civakî û rî û rism in. Du cureyên rê û risman yên sereke hene. Yek jê rê û rismên olî ne, ya din jî rê û rismên girêdayî salê, salvegerê û jiyana rojane ne. Rê û rismên olî, ji ber ku nivîskî ne, bi hezar salan dikarin bê guhertin bidomin. Her rê û rismek di nava xwe de bîreke civakî û çalakiyeke kevnare dihewîne. Dîrok bi vî rengî dijî. Pîrozbahiyên cejnê, rojî û rê û rismên veşartina miriyan tenê çend mînak in. Rê û rismên girêdayî jiyana rojane, li gor civakan, herêman, demê û pêşketinên teknolojîk diguherin. Cil û bergên folklorî û dawet mînakên van in. Heke em dawetên berê û yên niha bidin ber hev em ê gelek guherînan bibînin.

Dîroka kurdan jî piranî di nava folklorê de dijî. "Min dîroka kurdan ji kilaman hîn kiriye. Kilamên kurdî ji belegeyên fermî saxlemtir in." dibêje lêkolîner/nivîskar Ahmed Aras (Çîfçî, 2012). Kesên ku di kilaman de navê wan derbas dîbin ne kesên razber in. Ji vegotina bûyeran tê fêmkirin ku ew, kesên dîrokî ne, bi goşt û hestî ne. Neviyên gelekan hê jî li ser darê dînyayê ne. Digel ku di kilaman de bûyer bi rîzê nayîn vegotin jî, em bersiva pirsên wekî, *şer li ku derê qewimiye, di navbera kîjan aliyan de qewimiye, encam ci bûye û di şer de kî miriye û kî maye?* dibînin.

Di nav kurdan de, di warê kilamên şeran de, hosteyê herî mezin yê sedsala bîstan, bêguman Karapetê Xaço (1902-2005) ye (Kevirbirî, 2009a). Wek mînak, Karapetê Xaço yek ji wan dengbêja ku bûye şahidê şerê nav eşîrên kurdan û bi kilamên xwe ew dîroka kurda ya nenivîsandi li ser pelên çanda kurdî bi tîpêñ zêrîn nivîsandiye. Ew şerê ku li herêma Xerzan di navbera eşîrên Reşkotan û Etmankîyan de pêk hatiye bi xêra kilamên wî bi nav û deng bûye. Bi dengê Karapetê Xaço gihaye heta roja îro û dê her bimîne (Karacan ve Nayman, 2014). Karapetê Xaço -ku bi eslê xwe ermenî ye- li herêma Xerzan ji dayik bûye û demekê li mala Filîte Quto dengbêjî jî kiriye. Xaço, bi kilamên weke Filîte Quto û Usivê Seydo (Kevirbirî, 2009b), derbarê rewşa herêma Xerzan ya serê sedsala bîstan de gelek agahiyan dide me.

Di folklorê de hêza kevneşopiyê gelekî zêde ye. Hunera devkî, ji ber ku bi awayekî nivîskî nikare bê qeydkirin, heta gelek salan bi riya folklorê dikare bê parastin. Gelek caran ji bo bîranînê, serî li alikariya folklorê tê dayîn (Sokolov, 2009). Li gor lêkolîner/nivîskar Ahmed Aras, bûyerên ku di kilamên dengbêjan de hatine vegotin, ji sedî sed rast in. Mînaka vê yekê ya herî nêzik jî şerê mala Ûsivê Seydo ye. Aras dibêje ku:

Piştî ku min li kilamê guhdarî kir, ez bi pey belgeyên fermî yên derbarê vê bûyerê ketim. Min hin belge bi dest xistin. Min dît ku kilam û belge wekî hev in. Di ser de, hurgiliyên kilamê zêdetir in. Heke hûn ji min bawer nakin, neviyên wan jî hîn sax in, herin jê bipirsin. Ew dikarin gotinê min piştrast bikin.(Çifçi, 2014).

Di têkiliya folklor û dîrokê de, ji bilî kilaman, berhemên devkî yên wekî çîrok û destanan jî çavkaniyên baş in. Lê belê li vir me xwest ku, di çarçoveya kilaman de wekî destpêkekê, çend agahiyan bidin.

“Folklor hêzeke ku civata bê xwendin û nivîsandin bi hev ve girê dide ye.” dibêje Mehmed Uzun (Uzun, 2006). Rûmeta berhemên folklorî, bi jêhatîbûna vebêj ve girêdayî ye. Kî dikare bibêje ku berhemên nivîskî bêalî ne? Berhemên devkî ne bêalî ne; çêkirî ne, guherbar in û alîgir in. Yek ji aliyê dîroka devkî ya baş, derfeta bihevreditina rastiya şexsî û civakî ye. Ji serhatiyan, derfeta dîtina sazkirina pira navbera bîra şexsî û ya civakî çê dibe (Çağlayan, 2010).

Berhemên devkî ji bo dîroka gelên ku hê nebûne dewlet, çavkaniyên ferz in. Her ku berhem derbasî ser kaxizê bibin ê ev taybetmendî jî ji holê rabe. Lê heya wê demê divê ev berhem bêne parastin. Li aliyê din ve tu nivîs nikare cihê “deng” bigire. Lewma jî rîya parastina berhemên devkî ya herî baş, qeydkirina “deng”e (Porteli, 2005, r.222). Lê mixabin temenê teng berê bi temenê mirovan ve girêdayî bû. Ji ber kîmasiya derfetên teknolojîk iro em nikarin bigihêjin dengê dengbêjîn navdar. Ew yek ji bo gelê kurd jî wisa ye. Gelek dengbêj behsa xweşbûna dengê dengbêjîn navdar Evdalê Zeynikê dîkin. Gelek dengbêj kilamên wî dibêjin û hinek kesan jî kilamên wî ji devê dengbêjîn din girtine û nivîsandine. Lê mixabin, em çiqas berhemên Evdalê Zeynikê bixwînin jî, em ê tu caran bi tahma dengê Evdal nehisin.

Rastbûna bûyereke devkî li gor bîr, zanîn û ceribandina şexsî diguhere. Lewma jî carinan rastî û fantezî tevli hev dîbin. Lê her çi be jî divê ew serhatî, wekî dewlemendîyeke çandî û bîra civakî bêne dîtin û parastin. Çanda kurdî, him bi cihêrengiya xwe, him jî bi teşe û naveroka xwe gelekî dewlemend e. Li dijî astengiyêni siyasî, çandî, derûnî û aborî, mayîna ziman û çanda kurdî ya heta iro, bi tevkariya helbestvanê wekî Ehmedê Xanî ku berhemên nivîskî dane û bi dengbêjîn wekî Evdalê Zeynikê bûye. Di berdewama jiyîna wêjeya kurdî de divê mirov keda ku malbata Bedirxaniyan li müşextiyê dane jî ji bir neke (Erbay, 2009).

Bûyerên trawmatîk (wekî Terteleya Dêrsimê), di nav komekê de hestêن hevpar çêdikin û ew trawma di nav komê de nasnameyeke hevpar ava dike. Ew formasyon bandorê li ser nasnameya şehsî jî dike (Çelik, 2015). Mirov bi zimanê xwe, hisêن xwe, xeyalêن xwe û hêrsêن (xeyd) xwe bi lêv dike (Ceweri, 2004). Di belavbûn û xurtbûna wêjeyê de rola desthilatiyê jî gelekî zêde ye. Desthilatî li ku belav bûbe, wêje jî li wê derê pêş ve çûye. Ji ber ku li herêma Kurdistanê desthilatiya kurdan qels maye wêjeya kurdî ya nivîskî jî qels maye. Wek mînak, berhemên kurdî ku heta iro ji bo zimanê din hatine wergerandin gelekî kêm in. Ci berhememeke kurdî xelateke Nobelê ne stendiye. Li aliyê din ev nayê wê wateyê ku çanda kurdî ya devkî jî qels e.

Kilamên kurdî ku heta îro bi awayekî devkî jiyane diyar dikin ku kurd -di sînorêng de be jî- bune xwedîyê desthilatiyê. Dema ku mirov li dengbêjan guhdarî dike û li çîrokêng wan kilaman dînihêre, dibîne ku di wir de qala mîr û began tê kirin. Kilamên şînê, ji xeynî êşa ku hatiye kişandin gelek caran di derbarê navêng kesan, buyeran, herêman û xwezayê de jî agahiyêng hurgiliyan didin me. Yek ji peywira muzîkê ew e ku, dilê mirov rehet dike. Bêhna mirov dertîne û hestêng cûda di dilê mirov de peyde dike. Kilam dîbin berdevkêng hestêng mirovan yêng xweş û ne xweş. Ji vî aliyî ve kilamên şînê, di heman demê de dermanê birînan e, birînen kur dikewînin; êşen ku nayêng şîrovekirin vedibêjin (Elaldı, Bilgin, 2011). Kilam dîbin rîberê rewşenbîr û nivîskaran. Hin nivîskar û lêkolîneren kurd jî, ji van kilam, destan û çîrokan berhemên wêjeyî yêng nivîskî afîrandine. Romana *Dewrêşê Evdî* ya Eyüp Kîran (Kîran, 2011) û berhema lêkolînî ya Ömer Uluçay a bi navê *Derwêşê Evdî Destamî* (Uluçay, 2006), çavkaniya xwe ji destana Derwêşê Evdî, ku heta îro ji aliyê gelek dengbêjan ve hatiye vegotin, girtine.

Kilamên Kurdî jî -bi taybetî jî kilamên şînê û şeran- wekî kilamên gelêng din, bûyerêng ku di dîrokê de hatine jiyîn bi awayekî hunerî radîgîhînin roja me. Helbet bi hezaran kilamên ku li ser şer û şînêng ku pêkhatine hatine afîrandin hene lê derfetêng vê mijarê rî nadîn ku em van hemuyan binirxînin. Lewma jî emê li jêr li ser du mînakan bisekinin. Bi vî rengî em ê têkiliya buyerêng dîroka nêzik ya kurdan û kilamên ku dengbêjan li ser van bûyeran afîrandine derxin holê. Ji van yek li bi zaravayê kurmancî ye. Ya din jî bi zaravayê zazakî/kîrmancî ye.

Kilama Nîdayî Beg (Nemînim) û Dîrok

Divê mirov bi kûrahî li ser dengbêjiyê bisekine. Lewre dengbêjî dîroka gel ya nêzîk radixe ber çavan. Her kilameke dengbêjan bi taybetî jî kilamên şînê, beşek ji dîroka devkî ye. Dîroka devkî ji aliyekî ve ji bo fêmkirina dîrokê alîkariya me dike; ji aliyê din ve jî ji bo dahatûyê bîra civakê saz dike (Ersoy, 2009). Assmann dibêje ku bîra civakî, ji xeynî sazkirina rabirdûyê xwedîyê hêza bi hev ve girêdana dema niha û dema bê ye jî (Assman, 2001). Dema ku mirov têkeve nava kûrahiya dengbêjiyê mirov dê gelek tiştan bibîne. Yek ji van şahidbûna kilaman ya dîrokê ye. Ji ber ku zimanê nivîskî di nava civata kurdan da zêde belav nebûye, dîroka şerê nava dagirker û eşîran, yan jî şerê eşîrêng li dijî hev û sedemêng wan tevahî bi devkî ango bi çîrok û kilaman gihîştiye roja me. Lewma jî lêgerîn û lêkolînêng ku li ser kilamên kurdî çêbibin, ji bo nasîna kevneşopî, wêje, huner, erdnîgarî, jiyana manewî û dîroka kurdan ê bibin çavkaniyêng girêng (Veroj, 1997). Hebûna nav û cihêng ku di nava kilaman de derbas dîbin, derbarê dem û cihê serpêhatiyan de agahiyân dide me (Oğuz, 2010). Dibe ku hemî ne rast bin û zêdekîrin tê de hebin. Ew tiştêkî asayî ye. Lewre, kilam jî bi demê re diguherin. Lê ev yek nikare rastiya hebûna bûyerê ji holê rake. Her ku dema qewimîne kevin dibe û mirov ji herêma qewimîne bi dûr dikeve di kilamê de jî guhertin çêdibin lê dîsa jî hin agahî wek rastî hebûna xwe diparêzin. Gelek dengbêjîn kurd, li ser şer û qewimînêng ku di navbera dewleta Tirkîyeyê û eşîrêng kurdan de pêk hatine, kilam afîrandine. Ji ber ku gelek bûyeran di arşîva dewletê de cih negirtine û arşîvêng heyî jî ji gel re nehatine vekirin, çavkaniyêng kurdan yêng herî zindî kilam in. Kilama Reso ya bi navê “Nemînim” ji bo peyitandina vê angasta me mînakeke baş e. Em dikarin bi alîkariya vê kilamê bûyereke dîrokî ya dema nêzik ronî bikin.

...

*Xwedê belkî kula bixe mala Nîdayî Begê,
 Nîdayî Beg ji êvar da sekiniye derê hepsa Bazîdê
 Vediqetîne egîd û cindiya
 Hewşa Şewêş Efendî da
 Cinazê egîd û xweşmêra ji êvara xwedê da
 Xemilandiye di xûnê da bi singûya
 Herçî kuştin, herçî mayî girtin sirgûn kirin
 Berê wan dan Anadolê, Sînopê, Zongildaxê
 Dayê nemayê nav girtiya... (Dît, 2010).*

Dema ku em hinekî li van nav, herêm û bûyeran dinihêrin, gelek rastî derdikevin pêşıya me.

Nîdayî Beg: Serbaz Nidayi Çakıroğulları,

Bazîd: Navçeya Agırî ye (Doğubeyazıt),

Hepsa Bazîdê: Girtîgeha wê demê,

Hewşa Şewêş Efendî: Şewêş Efendî, kalikê wezîrê perwerdehiyê yê Partiya Demokrat,

Sînop û Zongildax: Ji gelek warên ku di dema 1926-1932an de kurd dihatin müşext kirin, du bajarên Tirkîyeyê ne

Wekî ku tê dîtin ji bilî dîroka bûyerê, gelek agahiyêna rasterast di kilamê de cih girtine. Ev yek jî diyar dike ku heke lêkolînên baş li ser kilaman werin kirin, wê di derbarê dîroka kurdan ya nenivîsandî de gelek agahî bêne berhevkirin. Bi taybetî jî kilamên şeran her yek bi serê xwe rûpelek ji dîroka kurdan e. Ji aliyê din de, bi teşeya xwe, bi naveroka xwe, bi tevn û hunandina ristan û bi meqam û awaza xwe kilama li jor, ji serî heta binî huner û wêje ye. Hostatiya dengbêj li ber çavan ne. Dibe ku dengbêj qewimîna bûyerê, ji devê hin şahidanbihîstibe. An jî li hin dengbêjîn din guhdarî kiribe. Lê belê ev kilam huner bixwe ye û neynika rastiyê ye.

Kilama Findiq Axa û Dîrok

Digel ku pergala Komara Tirkîyeyê, kurd û çanda wan tune hesibandine jî bi sedan kilamên şînê ku bi alîkariya dengbêjan gihaştine roja îro hene. Kilama Findiq Axayê kurê Qemer Axa yek ji van e. Ev kilam (Hewa'y Findiq Axa) ji aliyê dengbêjî navdar yê Dêrsimê, Silo Qiz ve hatiye gotin. Kilam bixwe bi zaravayê *kîrmancî/kirdkî* hatiye gotin. Li jêr beşek ji vê kilamê hatiye dayîn. Piştî ku em guh bidin kilamê, em ê bi çend gotinan li ser çîrok û dîroka wê bisekinin.

.....

De bîye bîye 'Ağâ' e mi bîye

Wuşene Seyd vano: "Teşmîl meve Qemer Ağâ

*Reyna giredame duzmune sere mîye
 Qemer Ağa gosro mine tifong berze
 Reyna giredame duzmune sere mîye”
 Wuşene Seyd vano: “Ez zon ke leme
 Kafir ma beno binê daraxaciye
 Ewro mara pers keno soxurê Kirmanciye**
*Zalim mara pers keno soxure Kirmanciye”
 Findiq Axa’ e mi leme berdo bine daraxaciye
 Findiq darê meerzê, sarr bêro şerê cwamerdiye

 Hêfê mi bêro cênciya Findiq ’î
 Hîre reê la vişîyo têpa erzenê dare
 Na dîna kêşte nîna buko dînaka bêtîvare... (Özcan, 2002)*

Findiq Axa, lawê yek ji pêşengên eşîra Yusufan, Qemer Axa ye. Qemer Axa di sala 1917-1918an de li dijî Rûsan şer kiriye. Ji ber vî şerî ji aliyê Mustafa Kemal ve hatiye xelatkirin (Bayrak, 1993) Di sala 1936an de Qemer Axa bi hêviya efû kirina dewleta tirk xwe dide dest leşkeran. Ji lawê xwe Findiq Axa jî vê yekê dixwaze. Finfiq Axa berê vê pêşniyarê napejirîne lê piştre ew jî xwe radestî dewletê dike. Lê mixabin rêvebiriya devleta tirk ya wê demê herduyan jî digre û davêje girtîgehê. Bavê wî di sala 1937an de di girtîgehê de dimire. Findiq Axa jî tê dardakirin. Dadgerê wê demê Îhsan Sabrî Çağlayangil jî vê buyerê piştrast dike. Ev kilam jî li ser dîyaloga Wuşenê Seyd û Qemer Axa ku li ser Findiq Axa dikan, hatiye afirandin. Bi kurt û kurmancî, kilam weha dibêje:

“H(w)usenê Seyd dibêje ku: “Were teslîm nebe,
 Emê dîsa rextêن xwe girêbidin,
 Were guh bide min; em ê bi hev re şer bikin.
 H(W)usenê Seyd dibêje: “Ez dizanim ew ê me bibin sêdarê
 Ew iro pirsa doza kirmanciyê li me dikan.
 Findiq Axayê min birine sêdarê
 Findiq Axayê darve nekin, bila xelk bê temaşa mîraniyê
 ...
 Heyfa min tê li xortaniya Findiq Axa
 Sê caran benê stûyê wî qetiyaye, lê dîsa darve dikan

* Ev peyy, di vê kilamê de bi wateya “pirsgirêka kurd” hatiye bikaranîn [explanation by Tekin Çetin].

*Ew dinya ji kesî ra namîne, dinyayeyeke derewîn e..” **

Wekî ku ji kilamê jî tê fêmkirin, Qemer Axa û kurê wî Findiq Axa ji aliyê rêvebiriya wê demê ve bi derewan hatine xapandin û bi fenan hatine girtin. Girtinê jî têrê nekiriye, yek di girtîgehê de ji ber ku nehatiye dermankirin miriye û yê din jî hatiye daliqandin. Sedem çi dibe bila bibe divê mirov neyên daliqandin. Dengbêj ji ber vê rewşê bi hêrs e û xemgîn e. Hêvî dike ku ew kesên ku ev xerabî bi Findiq Axa kirine ê li dinyayê payîdar nemînin û ê rojekê hesabê vî kiryarê xwe yê xirab li hember Xwedê bidin. Wekî ku em ê li jêr jî li ser bisekinin, ew kiryarê hanê ne tesadufî ne. Encamên polîtikîkayeke çewt in. Siyaseta ku demeke dirêj bi awayekî fermî hatiye meşandin, li ser qirqirina çanda kurdî û zimanê ye. Yek ji qadêñ pişaftinê ku hatiye diyarkirin jî herêma Dêrsimê ye.

Hewldanêñ Pişaftina Cand û Dîroka Dêrsimê ya Nêzik

Di wêjeya kurdî de gelek mînakêñ kilamên şînê-tevkûjiyê hene. Helbet di nav wêjeya welatêñ din de jî mirov dikare van mînakân bibîne. Lê belê, ji ber ku kuştin, tevkujî û müşextî wekî çarenûseke reş li pêşıya kurdan hatiye raxistin, di nav wêjeya kurdî ya devkî de mînakêñ herî bişewat cih girtine.

Li tirkiyê di sala 1936an heta 1952yan ji aliyê saziya Konservatuara Devletê ya Ankarayê ve, bi destê Muzaffer Sarisözen, Halil Bedi Yönetken, li gelek herêman xebatêñ berhevkirina kilaman hatine meşandin.(Özbek, 1981) Bi taybetî pişti salêñ 1930î, bi zanetî polîtikayêñ asîmîlasyona ziman û çanda kurdan hatiye destpêkirin. Ji bo vê yekê jî xebata pêşîn berhevkirina kilamêñ kurdî ye. Bi rêya saziyên wekî *Halkevleri (Malêñ Gel)* hin kes hatine herêma Kurdistanê, hunermendêñ wê demê bi darê zorê dane hev û kilamêñ wan tomar kirine. Piştre li zimanê wan, nav û naveroka wan kilaman guherandine û kirine tirkî. Di nav van kesan de Ferruh Arsunar keseñî girîng e. Arsunar kilam û beytên Elewî-Bektaşiyê yên kurmancî-kurmançkî dide hev lê bizanetî zimanê wan diqelibîne ser tirkî. Armanc ew e ku çanda kurdî û zimanê kurdî bê înkarkirin. Ji bo ku derewên xwe bidin bawerkirin, bi sedan pirtûk û kovar amade kirine. Di vê mijarê de Yönetken weha dibêje:

“Çiyayêñ asê, avêñ bi coş, beyarêñ xweşik yêñ Tunceli, çiqas xwezaya Anadolê bin, çanda muzîkê ya gelêñ ku li ser vê axê dijîn jî ewqas çanda muzîka tirk ya Anadolê ye. Lewma yî newayêñ muzîka vê herêmê jî dişibe newaya muzîka herêmên din” (Özcan, 2003).

Lê em baş dizanin ku rastiya çîrokê ne weha ye. Lewre digel hin aliyêñ hevbeş yên çanda Dêrsimê û çanda tirk hene jî, him ji aliyê bawerî, kevneşopîyan ve him jî ji aliyê ziman ve çandeke xweser ya Dêrsimê heye. Ew gotinêñ li jor jî diyar dîkin ku pergala Cumhuriyetê bi her awayî li ser înkara kurdan hatiye avakirin. Heger armanca wan parastina çanda kurdî ba, divê zimanê van kilaman jî nehata guhertin (Özcan, 2003). Ew rîbaza pişaftinê ne tenê ji aliyê peywirdarêñ devletê ve hatiye meşandin. Mixabin gelek hunermendêñ kurd yên wekî

* Bi qasî ku min ji kilamê fêm kir, min şîrove kir. Lewre kirmânciya min pir ne bas e[explanation by Tekin Cetin].

Celal Gûzelses, Îzzet Altınmeşe, Îbrahîm Tatlıses jî peyvên kilamên kurdî guherandin û bi vî rengî ew kirin malê çanda muzîka tirkî û bûn şîrikê vî gunehî. Di warê akademîk de jî gelek “rewşenbîrên” kurd û tirk bi berhemên xwe piştgirî dane van xebatên pişaftinê. Wekî mînak Prof. Dr. Kemal Karpat ku çepgir û Kemalist wî didin ser serê xwe, di berhema xwe ya bi navê *“Türk Edebiyatında Sosyal Konular”* (Di Edebiyata Tirkî de Mijarê Civakî) de dibêje ku:

Li hember vê rewşa ku mamosteyekî li Rojhilatê Anadolê vedibêje, helbestvan helbet nikarin xwe ragirin: (Li Bîngolê navê şahiyê tuneye. Min qet kilam nebihîstin. Hevalê min Hanefî Beg sê salin li wir bûye, wî jî kilamek bi tenê jî nebihîstiye (Karpat, 1971).

Mehmet Bayrak di vê mijarê de dibêje ku ew gotinên Karpat, ne rast in. Lewre pişfî Karpat bi 10-15 salan ez çûm wê herêmê û min bi tena serê xwe, li herêma Bîngolê ji du sed hebî zêdetir kilamên kirmancî û kurmancî berhev kirin (Bayrak, 2012). Herweha îro jî bi dehan dengbêjîn vê herêmê hene û kilamên xwe dîsa kurdî dibêjin. Digel hemû zor û zextan jî kilamên kurdî li ser lingan e. Mixabin em dikarin bibêjin ku ew politîkayêن pişaftinê di warê kilam û beytên Elewîtiyê de hinekî bi ser ketine. Bi hezaran beyt, dia û kilamên kurdî (Bi taybetî yêñ bi zaravayê kirmancî) wenda bûn; çanda kirmancî qels bû û di binê malan de rizîya. Nifşen nû ji kirmancî dûr ketin (Elaldi, Bilgin, 2011). Heger îro di ayînên Cemê de zimanê tirkî tê bikaranîn, ew nîşana serkeftina xebatên pergala Cumhuriyetê ye. Divê ev mijar bi berfirehî bê niqaşkirin. Lê sînorên vê xebatê rê nadin vê niqaşê. Helbet xebatên pişaftinê ne tenê bi rîya berhevkirin û guherandina kilaman hatiye kirin. Wek mînak, di sala 1925an de “Şark Islahat Planı” (Plana Sererastkirina Rojhilat) hatiye amadekirin. Pişfî vê planê bi sed hezaran kurd ji cih û warêñ xwe bûne û hatine müşextkirin. Li dibistan û dadgehan axaftina bi kurdî hatiye qedexekirin, perwerdehiya bi kurdî hatiye qedexekirin. Din av pirtûkan de peyva “Kurdistan” hatiye derxistin û hwd.(Bayrak, 2013). Hezar mixabin ku ew politîkayêن pişaftinê, îro jî (kêm be jî) di qadêñ cûda de têne meşandin. Ew jî mijara xebateke din e.

Heger em vejerin ser mijara pişaftina çanda kurdî ya bi rîya muzîkê, em dikarin bibêjin ku li dijî xebatên pişaftinê, di salêñ 1970-1980an de bi pêşengîya dildarêñ folklora kurdî yêñ wekî Mesut Özcan û Mehmet Bayrak ev kilamên Dêrsimê tomar kiriye. Bayrak, ev kilamên ku berhev kirine wekî sê bergên qirase, bi navê *Kürt Müziği, Dansları ve Şarkıları (Muzîk, Dans û Şarqiyîn Kurdi)*, di sala 2002an de çap kiriye (Bayrak, 2002). Di berga pêşî de gotarêñ gelek kesên hêja, ku di mijara muzîka kurdî de pispor in, cih girtiye. Her du bergên din jî ji textêñ kilaman û notayêñ hinekan pêk têñ. Mesut Özcan jî bi navê *Öykülerile Dersim Ağıtları* (Özcan, 2002) pirtûkeke ku ji du bergen pêk tê amade kiriye. Îro hejmara xebatêni bi vî rengî gihaye hezaran. Ji xeynî van xebatan bi destxistina hin derfetêñ perwerdehî û teknolojiyê muzîk û kilamên kurdî belav dibin.

WEKİ ENCAM

Kilamên dengbêjan yêñ şînê, bîra civakê saz dikin. Helbet ev sazkirin bi rîyeke estetîk pêk tê. Dengbêj bi kilamên xwe dibin berdevkê êş û azarêñ ku di demêñ berê de hatine jiyyîn. Serpêhatiyêñ şexsan dikin malê gel û bi vî rengî têkiliya nifşen nû û yêñ kevin saz dikin. Di

kilamên şînê de wate û huner di nava hevsengiyekê (denge) de ne. Di çanda kurdî ya devkî de, bi taybetî jî kilamên dengbêjan yên şer û şînan de şopêن dîroka kurdan ya nêzik hene. Lewma jî divê em bidin ser şopa kilaman. Her kilamek rê li ber niqaşa dîroka fermî ku li me hatiye ferzkirin vedike. Divê em hîmê çand û dîroka gelê xwe ya nêzik li ser van kilaman deynin. Ew kilaman dikarin hest û ramanêن ku pêşiyêن me hîs dikirin bime bidin fêmkirin. Herweha ew kilam dikarin rê li ber pişaftina çand, ziman û muzîka kurdî bigrin. Ji bo vê yekê jî divê kilamên kurdî ji aliyê kurdan ve bêyî ku bêne guhertin werin tomarkirin. Li ser van deng û kilamên tomarkirî divê xebatê akademîk bêne pêşxistin. Divê di zanîngehan de derfeta lêkolînêن muzîka kurdî bêne sazkin. Yan na piştî ku dengbêj bimire ê deng û reng jî tevî çand û dîrokê bi wî re bimirin.

ÇAVKANÎ

- Bayrak, M. (1993). *Kürtler ve Ulusal-Demokratik Mücadeleleri*. Ankara: Özge.
- Bayrak, M. (2002). *Kürt Müziği Mansları ve Şarkıları* (Berg 1-3). Ankara: Özge.
- Bayrak, M. (2012). Ağıtlama-Şarkılarda Dersim Soykırımı. www.politikart1.blogspot.com
Retrieved on June 06, 2015.
- Bayrak, M. (2013). *Kürtlere Vurulan Kelepçe: Şark İslahat Planı*. Ankara: Özge.
- Cewerî, F. (2004) Ziman Bingeh û Çavkaniya Edebiyatê Ye. Vesta, Bihar-Havin, 135-138.
- Connerton, P. (1999). *Toplumlar Nasıl Anımsar?* Alaeddin Şenel (Wer.). Stenbol: Ayrıntı.
- Çağlayan, H. (2010). *Analar, Tanrıçalar, Yoldaşlar*. Stenbol: İletişim.
- Çelik, A. (2015). Eşîra Xiyan, Bîra Kollektîf û Trawma: Îşeke Patetîk Li Dor Kilama Reben im. *Wêje û Rexne*, 4, 180-202.
- Çifçi, T. (2014). *Kilam û Jin*. Stenbol: Nûbihar.
- Dît, N. (2012). Şiir ve Stran Tahlilleri-4, www.kovarabir.com. Retrieved on January 31, 2012.
- Elaldi, Ö. & Bilgin, D. (2011, 9 Aralık). Ağıtlarda Dersim Soykırımı 2. <http://www.ozgurgundem.com/haber/26814/agitlarda-dersim-soykirimi-2>
- Erbay, V. (2004). Li Ser Wêjeya Kurdî Ya Hemdem Ramanêن Kesane. Mahsum Taşkesen (Wer.). Vesta, Bihar-Havîn 2004, 108-112.
- Karacan, H. & Nayman R. (2014). Dengbêj Salihê Qubînî ile Karapetê Xaço'nun Şarklarında Aşiret Kavgaları: "Fîlîte Quto İle Elî Etmankî Kavgası". *Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, c.16/2, 361 – 388.
- Karpat, K. (1971). *Türk Edebiyatında Sosyal Konular*. İstanbul: Varlık.
- Kevirbirî, S. (2009a). *Sedsala Qêrinekê Karapetê Xaço*. Stenbol: Do.
- Kevirbirî, S. (2009b). *Fîlîte Quto: Bîst Kilam û Bîst Qewimîn*. Stenbol: Do.
- Kıran, E. (2011). *Derwêşê Evdî*. İstanbul: Nûbihar.
- Oğuz, C. (2010). Hevpeyvîn: Dengbêj Mihemedê Serhedî. *Tiroj*, 46, 45-48.

- Özbek, M. (1981). *Folklor ve Türkülerimiz* İstanbul: Ötüken.
- Özcan, M. (2002). *Öyküleriyle Dersim Ağtları 1* (Arekerdox). Ankara: Kalan.
- Özcan, M. (2003) *Kürdün Gelini (Notalarıyla Tunceli Halk Türküleri ve Oyun Havalari)*, Ankara: Kalan.
- Özcan, M. (2006). *Öyküleriyle Dersim Ağtları (B. 1-2)*. Ankara: Kalan.
- Porteli, A. (2005). Sözlü Tarihi Farklı Yapan Şey. Kürşat Korkmaz (Wer.). *Milli Folklor*, 68, 222-234.
- Sokolov, Y. M. (2009). *Folklor, Tarih ve Kuram*. Yetke Özer (Wer.). Ankara: Geleneksel.
- Uluçay, Ö. (2006). *Dewrêşê Evdî Destamî*, Stenbol: Do.
- Uzun, M. (2006). *Dengbêjlerim*. Stenbol: İthaki.
- Veroj, S. (1997). Folklora Kurdî. *War*, 1, 112-132.
- Yonetken, H. B. (2003) Tunceli. *Kürdün Gelini (Notalarıyla Tunceli Halk Türküleri ve Oyun Havalari)*. Mesut Özcan (Edit). Ankara: Kalan.



A Survey on Loanwords from English to Kurdish

Rebin Abdulqader Azeez¹, Hawkar Akram Awla²

Received: December 11, 2015 Accepted: December 22, 2015

Abstract

In this going-over study, words borrowed from English to Kurdish are scrutinized. More than 350 words are found to be derived from English to Kurdish as loanwords. In conformity with the wordlist which accompanies this research, the patterns of these words are categorized with reference to phonological-oriented criteria as assimilated, partially-assimilated, and non-assimilated borrowings. The assimilated genres were noticed to be the most frequently borrowed types of words from English to Kurdish. The meanings of each loanword from the donor (English) to the receiver language (Kurdish) are unchanged. However, the pronunciations of certain forms of loanwords are changed partly or naturalized. That is, the halfway assimilated loanwords may still be recognized as borrowings, but the non-assimilated ones are somewhat unrealizable.

Keywords: English language, Kurdish language, Sorani dialect, loanwords, borrowing

Puxta

Lam twēzinawa lēkōlin amēzadā, wṣā xwāstrāwakān la ingliziyawa bo kurdi lēyān dakoídretawa. Zyātr la 350 wṣā dadozrētawa ka la ingliziyawa hatuna nāw kurdi waku wuṣai xwāstrāw. Ba gwērai aw lista wṣayai ka lagal am twēzinawayadā dēt, s̄ewazakāni am wṣāna polēn krāwn ba gwērai pēwari tāibati fonoloji waku wṣai xwāstrāwi cūnyak, nimcā cūnyak u nā cūnyak. S̄ewāza cūnyakakān wā tēbini dakrān kawā bāwtrin jori wṣai xwāstrāu bn la ingliziyawa bo kurdi. Manāi har wṣayakai xwāstrāw la zmāni baxşar (inglizi) bo zmāni wargr (kurdi) nagorāwa. Harchanda, s̄ewāzi bēzāni handē s̄ewai tāibati wṣā xwāstrāwakān başewai başı dagorēn yāxud ba xomāli dakrēn. Amaş manāi waya, wṣā xwāstrāwa nimcāiya cūnyakakān lawānaya heştā har waku wṣai xwāstrāw sayir bkrēn, balām wṣā xwāstrāwa nācūnyakakān tā rādayak nazānrāwn.

Paivin Saraki: zmani inglizi, zmani kurdi, diyalékti sorani, wṣai xwastrawakan, xwastn.

Recommended citation:

Azeez, R. A. & Awla, H. A.(2016). A survey on loanwords from English to Kurdish. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp.11 – 28.

¹ Corresponding Author: Koya University/ English Language Department– Kurdistan Region of Iraq
E-mail: rebin.abdulkadir@koyauniversity.org

² English Language Department, Koya University, Kurdistan Region of Iraq. E-mail:
hawkar.akram@koyauniversity.org

1. INTRODUCTION

Borrowing is one of the language change and language evolution related phenomena that subsists within every language around the world. Borrowing is explicated as word from one language that has been adapted for use in another (Nordquist, 2014: 1). This comes about when two languages interject socially, culturally, economically, or politically. Moreover, language itself is a means of communications, for this reason languages are used in order to maintain this goal of interaction in various ways. Languages are varied and are classified according to historical, geographical, cultural, and socio-economical facets and prospects. This has led to diversity in borrowing as an aspect of language use from a language to another.

Furthermore, one language may have words for which there are no equivalents in the other language. There may be words for objects, social, political, and cultural institutions and events or abstract concepts which are not found in the culture of the other language. It often occurs that one culture borrows from the language of another culture words or phrases to express technological, social or cultural innovations. For instance, English borrowings are entering languages everywhere, and in more domains than just science and technology (Nordquist, 2014: 2).

In conformity with Hassanpoor (1999: 10), Borrowing is a historical phenomenon; it is a product of different circumstances and plays different roles under changing situations. All languages change and borrowing is a dominant trend of language contact and change. The term ‘borrowing’ however usually implies a temporary transmission of possession to be followed by the return of the borrowed item at a later stage. But language borrowings are permanent. All components of language, from phonemes to words to grammatical structures, may be borrowed from one language to another.

1.1 *The problem*

Every language in this world has its own set of vocabulary. However, sometimes words from one language find their ways into the vocabulary of another language because these languages may have been in contact in one way or the other. When two or more languages come into contact with one another, borrowing may take place.

English language is seen as a central foreign language in Kurdistan region. Historically speaking, Kurdish language has been in contact with English when it became a prestigious language around the world. More specifically, this interaction became more prominent when England invaded Iraq and Kurdistan as northern part of the country exposed to that language in the long run. Later, English was entered in the process of teaching and learning English as a foreign language. Moreover, Media has played great role in using different vocabulary items from English into Kurdish language verbally and non-verbally.

For all that, a few studies have been conducted to explore the amount of loanwords from English to Kurdish. This current research only investigated the Iraq/Kurdistan part using

Sorani dialect. Therefore, the present study is intended to survey about lexical borrowings from English to Kurdish.

1.2 Aim and Significance

This paper draws a bead on firstly, examining the loanwords from English to Kurdish. Secondly, it also puts forward an endeavor to establish a wordlist that compiles nearly all the loanwords from English to Kurdish.

This study addresses a worthwhile state of consideration that needs to be resolved. Thus, college students, EFL teachers, linguists, and researchers in the field can get benefit from the results of the study. That is, this survey study will allow everyone to inspect and see the extent to which English words are borrowed to Kurdish as their mother tongue.

2. BACKGROUND

2.1 The Concept and Classification of Borrowing

Every language in this world has its own set of lexical items. However, sometimes lexical items appear in the vocabulary of another language due to the possible contact of the two languages. When two or more languages encounter each other, borrowing may occur (Marjie-Okyere, 2013). Crystal (1985:36) defines borrowing as “linguistics forms being taken over by one language or dialect from another. Similarly, Hudson (1980) regards borrowing as the linguistics process that requires taking words from a language into another.

Haugen (1950) classifies borrowing into two main types: importation and substitution. The former involves taking a pattern into a language while the former latter involves replacing something in another language with a native pattern. He further sub-classifies borrowing into loanwords, loan blends and loan shifts. Loanwords require the importation of form and meaning with levels of phonological replacement which may take place as none, partial, or complete replacement of the borrowing form. Loan blends entails a combination of both foreign and native forms, in which there is only partial morphemic importation. That is to say, a native morpheme has been replaced by part of the foreign word.

Loan shifts involves the representation of a foreign concept by a native form. Haugen further classifies loanwords on the basis of oral borrowing into unassimilated, partially assimilated and wholly assimilated loanwords.

Hassanpoor (1999) applies Haugens' division of loans to classify loans in Sorani as loanwords, loan blends and loan shifts. Hassanpoors' study “A Study of European, Persian and Arabic Loans in Sorani” is the most comprehensive study ever conducted on loans in Sorani. Various words can be seen in Kurdish Sorani dialect which were borrowed from different languages such as Arabic, Persian, English, and Turkish. Yildiz and Akbarov (2012) examined the borrowed words from Turkish which have directly or indirectly been borrowed. Moreover, Sadiq (2011) indicates that the Kurdish word *babe* has directly been taken from the English word *babe*. There is a dearth of research on Sorani loanwords that have been taken from English. It is hoped that this study can fill the gap from this respect.

2.2 Some Motivations for Borrowing

Despite of defining and classifying the borrowing phenomenon, linguists have attempted to identify the motivations that lead someone to borrow words from another language. The most popular motivations for word borrowing as Durkin (2009) states are the need and prestige. The former occurs when a new concept or thing is discovered which already has a name in the donor language but not in recipient language. For example, the word *kompeter* has been borrowed from English because the computer was first invented by an English person. The latter takes place when a speaker feels that there is greater social cachet connected with a word from another language. English as prestigious languages has become the main source of borrowing for other less prestigious languages including Kurdish. Bloomfield (1984, in Newman, 2002) is of the opinion that usually a subordinate language mostly borrows from a dominant one.

Bloomfield (1933, in Mohammed, 2009) indicates that political-social conditions such as colonization, war, conquest, and migration results in the dominance of one language over the other. Thus, the rapid advances in technology and other facets of life such as colonization might have forced Kurdish to borrow words from the English language. The colonization of Iraq by Britain may have led to the borrowing of some English words by Kurds. The US-led invasion might also have resulted in borrowing some English words by Kurdish speakers.

Media whether spoken or written is another factor which affects borrowing (Marjie-Okyere, 2103). Sabir (2013) examined the increasing use of English loan words in political programs at visual media in Kurdistan region and found out that announcers, reporters, and editors prefer to use English to Kurdish equivalents due to their lack of knowledge of Kurdish equivalents, modernity and better image, prestigiousness, the length of the Kurdish terms, for varying the vocabulary, and for showing off.

2.3 English and Kurdish

In conformity with Stokes, Gorman, and Newman (2009: 281), Kurdish is of the northwestern subgroup of those Iranian languages related to the Indo-Iranian branch of the Indo-European languages. The original language of the area was Hurrian, they are as far apart from each other as German and English. Accordingly, they may also be referred to as distinct languages in their own right. In addition, both Kurmanji and Sorani encompass a large number of regional and local dialects and sub-dialects, although speakers of these dialects usually can understand each other. The other forms of Kurdish language are Gorani and Zaza. The former is spoken in southern Kurdistan and Kermanshah in Iran as well as the Halabja region of Iraqi Kurdistan and in the Hewraman Mountains bordering Iran and Iraq. The latter is spoken in the northwest parts of Kurdistan.

Furthermore, many endeavors to create a standard written language or to bridge the gap between Kurmanji and Sorani have not been successful. The two have developed almost independently of each other. Sorani, for example, is dominant for its having been the language of the city of Suleymaniya and Erbil, now in the north of modern Iraq, founded in the 18th

century by the Baban state, a Kurdish state in the Zagros Mountains. From the late 19th century Kurdish intellectuals began writing in Kurmanji. Sorani developed mainly as the language of poetry until the fall of the Ottoman Empire early in the 20th century (Stokes, et al, 2009: 282).

Depending on English language Club Website (2014), English is a member of the Germanic family of languages. Germanic is a branch of the Indo-European language family. Additionally, according to Merriam-Webster Online Dictionary (2014), the history of English is conventionally divided into three periods called Old English (or Anglo-Saxon), Middle English, and Modern English. The earliest period begins with the migration of certain Germanic tribes from the continent to Britain in the fifth century A.D., and it continues until the end of the eleventh century or a bit later. The period of Middle English extends roughly from the twelfth century through the fifteenth. The influence of French and Latin upon the lexicon continued throughout this period. The period of Modern English extends from the sixteenth century to our own day.

Other important early developments include the stabilizing effect on spelling of the printing press and the beginning of the direct influence of Latin and, to a lesser extent, Greek on the lexicon. Later, as English came into contact with other cultures around the world and distinctive dialects of English developed in the many areas which Britain had colonized, numerous other languages made small but interesting contributions to its word-stock (Merriam-Webster OD., 2014).

Nowadays, American English is particularly influential, due to the USA's dominance of cinema, television, popular music, trade and technology (including the Internet). But there are many other varieties of English around the world, including for example Australian English, New Zealand English, Canadian English, South African English, Indian English and Caribbean English (English Club Website-History of English language, 2014).

With references to Durkin (2014), during the medieval and early modern periods the influence of English spread throughout the British Isles, and from the early seventeenth century onwards its influence began to be seen throughout the world. The complex processes of exploration, colonization and overseas trade that characterized Britain's external relations for several centuries led to significant change in English. Words were derived from all over the world through the languages of other trading and imperial nations such as Spain, Portugal and the Netherlands. In the meantime, new varieties of English emerged, each with their own vocabulary and grammar and their own distinct pronunciations. More recently still, English has become a *lingua franca*, a global language, regularly used and understood by many nations for whom English is not their first language.

By the same token, the life of loanwords in Kurdish is, among others, the story of the transformation of a pre-modern society, the division of Kurdistan among four nation-states, domination and subordination, the rise of Kurdish nationalism, modernization and standardization of the language (Hassanpoor, 1999: 10).

3. METHODOLOGY

3.1 Instrument

In the present survey study, the researchers depended on a wordlist in order to collect the data. First, an English- Kurdish dictionary by Karadaghi (2006) is used to identify and illustrate all the vocabulary items (words) that are taken from English to Kurdish. That is, the words which are collected form the aforementioned dictionary were thought to be borrowed in certain ways from English to Kurdish. Later, the types of the loanwords were identified according to the conventions of borrowing from a language to another. The vocabulary items (see appendix: A) are all listed alphabetically. The researchers used the list to highlight loanword types and to show the variety of words taken from English to Kurdish language.

3.2 Data Collection

The data collection procedure in this current study is done by looking closely into a wordlist based on an English- Kurdish dictionary by Karadaghi (2006) for the loanwords from English to Kurdish.

3.3 Data Analysis

In the analysis of the collected data which are later converted into a wordlist of English loanwords to Kurdish language, the researchers tried to inspect and explore the types of borrowing and make sure if the words are used in formal or informal Kurdish language. Later, the researchers validated the wordlist in collaboration with Kurdish Department/Koya University teaching and language expert staff to see the validity and reliability of the English loanwords to Kurdish that were collected during the study. The staff was comprised of two PhD holders in Kurdish language (linguistics branch) who were teachers in the mentioned context. They investigated the wordlist thoroughly and confirmed that the established wordlist is a proper raw material to see the amount of English loanword to Kurdish and to explicate the types of borrowing from the donor to the hosting language.

4. RESULTS AND DISCUSSION

The results in the present study confirm that loanwords from English language to Kurdish vary depending on the patterns of borrowing from the donor to the recipient language. That is, the way a word or phrase is borrowed can be classified into two major distinctive patterns, namely, importation and substitution. The former denotes that a word is borrowed without changing in meaning and sound, while the latter represents a borrowing which replaces something from the donor with a native pattern in the receiver.

In conformity with Muhammad (2009), the findings in this study can be further classified into three phonological-based patterns that represent certain oral borrowing features. In other words, the loanwords which were collected by the researchers of the present

study are found to be classified into assimilated¹, partially assimilated², and non-assimilated³ borrowings. The total number of gathered loanwords is 358 words that are enlisted in the wordlist, see appendix (A). The assimilated pattern of an English loanword is recognized as a word that is borrowed by speakers of the recipient language as it is pronounced in its original donor form. Partially assimilated English loanwords are produced with the partial substitution of a sound with a vowel or a consonant. Non-assimilated English loanwords, however, are words which were produced by the recipient users totally differently from the original English word.

For instance, the words *academy, band, canal, dance, feedback, gallery, helicopter, idiom, keyboard, logic, mall, normal, organ, page, quiz, robot, sample, tanker, vitamin, wrong-side, and zigzag* are assimilated loanwords from English to Kurdish. That is, these borrowed words are brought to Kurdish without changes in meaning and pronunciation. According to the results, 196 loanwords were selected as assimilated patterns. Concerning the partially-assimilated loanwords, the researchers pointed out 128 patterns that are brought into Kurdish with changes in pronunciation. The borrowed words were being modified by replacing with a vowel or a consonant in the receiver language such as, *agency, balloon, cable, dialogue, expire, fault, game, heater, film, jacket, karate, lamp, massage, opposition, hello, passport, restaurant, satellite, telephone, and wire*. However, the non-assimilated loanwords are lesser than other patterns in number which were about 34 patterns being borrowed into Kurdish with entirely distinct states such as, *automobile, biscuit, bulldozer, cigarette, dashboard, giraffe, jeep, kettle, machine, pliers, samovar, and toilet*. See Table 1 for phonologically-based loanwords with distinct features and total numbers per each pattern.

Table 1: Classifications of Loanwords from English to Kurdish
Kürt dili izafesi ile ilgili ek çalışmalar, Kürtçe isim tamlaması ile ilgili önemli bir dizi soruya açıklık getirir. Verilen bir önadın sadece bir sıfat tamlaması ya da sadece bir edat tamlaması tarafından değiştirileceğinin gerçekten de durum olup olmadığını örneği araştırmalıdır. İlaveten, birinin Kürtçe 'deki bir ismin yardımcı ve tamamlayıcı öğelerini ve bu öğeler arasındaki hangi sözdizimsel farklılıklarının bu ayrimın belirtileri olduğunu ayırt edemeyeceği henüz net değildir. Bu çalışmada önemsenmeyen bazı ileri düzeydeki karışık durumlar daha detaylı incelenmelidir. Öncelikle, Kürtçe'nin bazı lehçelerinde belirli ve belirsiz izafe belirteçleri arasında bir ayrim vardır; ancak diğerleri, örneğin Türk lehçesi belirtisiz izafeyi tamamen kaybettiği görünüyor. İkincisi, bir ad ya da ad tamlaması için olan durum ve kurallar incelenmelidir. 23. örnek, tüm yapının değişmesine rağmen bağlantılı cümledeki sonad sadece izafe ekinin hangi adla görüneceğini belirler.

23. <i>Mizgîn</i>	<i>li</i>	<i>sîna di-ya</i>	<i>xwe</i>	<i>li</i>	<i>[xwişk ü</i>
Mizgin	Instead	mother-EZ.FEM.SG	REFL	on	sister and
Mizgin	yerine	annesinin		(belirteç)	e kızkardeş ve
		<i>bir-ê]</i>	<i>xwe</i>		<i>di-nêr-e.</i>
		brother-EZ.M.SG	REFL		DUR-watch.PRES-2/3.SG
		erkek kardeş	(belirteç)		(bakmak)

'Mızgin cares for her sisters and brother in her mother's stead.' (Wurzel 1997:63)
(Mizgin, annesinin yerine kız kardeşlerine ve erkek kardeşine bakar.)

Mızgin'in sadece birkaç kız kardeşi ve bir erkek kardeşi olduğu yukarıdaki bağlamdan açıkmasına rağmen, bağlamdaki sonad 'da görünen izafe, 23.örnekte kendini tekil eril yapan ad tarafından belirlenir. Ancak 24. örnek, önceki ek bir değiştiriciyle klitik izafe işaretleyicisinin tüm değiştirilmiş isim tamlamasıyla uyuşmasını ve böylece çoğul yapıda göründüğünü gösterir.

24. <i>[Xwişk ü bira-k-i]</i>	<i>wê</i>	<i>yêñ</i>
Sister and brother-INDEF-EZ.MASC.SG.INDEF	3.SG.FEM.OBL	EZ.PL
Kızkardeş ve erkek kardeş (belirtisiz eril)	(tekil dişil)	biz(çoğul)

<i>picûk</i>	<i>he-ne.</i>
small	exist-PL.
(küçük)	var-(çoğul)

'She has little sisters and a little brother.' (Wurzel 1997:63)

'Küçük kız kardeşleri ve bir erkek kardeşi var.'

Sonuncusu ve en önemlisi, Farsçada hafifçe farklılık gösteren Fars izafesi ile Kürt izafesini karşılaştırmak oldukça ilginç olabilir. Şu an ki çalışma önerisi ile karşılaşırılabilecek (Kahnemuyipour 2000 gibi) Farsça yapısının analizi ile ilgili birkaç tane öneri olmuştur.

5. SONUÇ

Bu çalışmada yapılan analizler, LFG teorisinin söz dizimselinde, Kürtçe sözdizimindeki isim tamlamalarını açıklayan ilk çalışmalarдан sadece biri olmasına rağmen; bu çalışmanın hem ne kadar zor hem de o ne kadar büyüleyici olduğunu gösterir. Kürt izafenin resmi söz dizimlerdeki teorilerin yeterli ilgi görmemesi gibi ‘yapıları birleştirme’ benim ilk izlenimimdir. Olayın kendisi o kadar nadir değildir. İlgili yapılar Tagalog¹³ gibi birçok farklı diller ve dil ailelerinde görünür (Himmelmann 1997). Bu yüzden LFG gibi resmi bir teorinin bu durum için seçkin analizler sunup sunmayacağı ya da bir tüm yeni yapı çeşidinin var olan sözdizimsel teorileriyle birleştirilip birleştirilmeyeceğini görmek verimli bir çalışma olmalıdır.

TERİMLER:

DP	Aitlik öbeği / iyelik eki
PP	Edat öbeği
NP	İsim tamlaması / Ad öbeği / İsim cümlecigi
PRED	Yüklem

¹³ Filipinlerin resmi dili

CASE	Durum	MAS	Eril
OBL	Nesne	DEM.SIG.OBL	Belirtili Tekil Nesne
Adjunct	Belirteç	1.SG.OBL	1.Tekil Şahıs
Complement	Tamlayan	MASC. SG	Eril Tekil Şahıs
Num	Sayı	Fem. SG	Dişil Tekil
SG	Tekil	Qnt	Miktar/Sayı
PL	Çoğul	Prn	Zamir
AP	Sıfat Öbeği	POSS	Aitlik
EZ	İzafe	GEND	Cinsiyet
Clitics	Klitik	MAS	Eril
FEM	Dişil	DEM.SIG.OBL	Belirtili Tekil Nesne

6. KAYNAKÇA

- Bresnan, Joan (2001): Lexical-Functional Syntax. Blackwell Textbooks in Linguistics 16. Blackwell Publishers, Malden, Massachusetts.
- Himmelmann, Nikolaus P. (1997): Deiktikon, Artikel, Nominalphrase: zur Emergenz syntaktischer Struktur. Max Niemeyer Verlag, Tubingen.
- Kahnemuyipour, Arsalan (2000): Persian Ezafe Construction Revisited: Evidence for Modifier Phrase. In: Proceedings of the 2000 annual conference of the Canadian Linguistic Association, pp. 173-185.
- MacKenzie, D. N. (1961): Kurdish Dialect Studies I. Oxford University Press, London. Sadler, Louisa (1997): English Auxiliaries as Tense Inflections.
Online: citeseer.nj.nec.com/sadler97english.html.
- Sadler, Louisa (1998): Welsh NPs without Head Movement. In: Proceedings of the LFG98 Conference, University of Queensland, Brisbane. CSLI publications.
Online: <http://www-csli.stanford.edu/publications/>
- Wurzel, Petra (1997): Rojba,s. Einführung in die kurdische Sprache. Sprachenreihe Reichenert. Dr. Ludwig Reichert Verlag, Wiesbaden.

Di Çarçoveya Teoriya Performansê de Nirxandina Vegotinên Gelêri

An Evaluation of Folk-narratives in the Frame of Performance Theory

Necat Keskin¹

Received: January 4, 2015 Accepted: January 26, 2015

Abstract

Folk-Narratives such as folktales, myth, epos, legend are genres of the folk literature which is one of the main branch of folklore discipline. Those narratives have been transferred from generation to next one orally and anonymously for centuries. In the very beginning of the folklore discipline those genres have been evaluated as a text which mostly ignored their context and texture. In the 1970's discussing over evaluating them in their contextual performing began among folklorists. In this frame re-narrating of those folk narratives and even their exhibition begun to be subject of the works. In this article, some examples of turkish and kurdish folk narratives such as 'Uykudan önce (before sleeping)', 'Intangible Heritage Museum', "Dengbêj in the Dengbêj House", 'Mem û Zîn', and 'Pîrê û Rovî (a kurdish folktale)' have been dicussed and evaluated in the frame of performance theory which is one of the recent influential theories of folklore.

Keywords: Folk Narratives, Turkish, Kurdish, Performance Theory, Zarok tv.

Özet

Masal, mit, destan, efsane gibi halk anlatıları, folklor disiplinin bir ana dalı olarak halk edebiyatının türleridirler. Bu anlatılar yüzyıllar boyunca kuşaktan kuşağa anonim ve sözlü olarak aktarılmışlardır. Folklor disiplinin başlangıcından itibaren bu türler metin olarak değerlendirilmiş, bağlam dokuları çoğunlukla göz arı edilmiştir. 1970'lerde folkloristler arasında bu türleri kendi bağlamlarında değerlendirme tartışmaları başlamıştır. Bu çerçevede halk anlatılarının yeniden söylemesi hatta onların sergilelenmesi de çalışmaların konusu olmaya başlamıştır. Bu makalede, 'Uykudan önce', Somut Olmayan Kültürel Miras Müzesi', 'Dengbêj ve Dengbêj evlerinde Dengbêjlik', 'Mem û Zîn', 'Pîrê û Rovî' gibi Türk ve Kürt halk anlatılarından örnekler verilmiş ve bunlar yakın etkili folklor teorilerinden birisi olan performans teori bağlamında değerlendirilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Halk Anlatıları, Türkçe, Kürtçe, Performans teori, Zarok tv.

Recommended citation:

Keskin, N. (2016). Di Çarçoveya Teoriya Performansê De Nirxandina Vegotinên Gelêri [An Evaluation of Folk-narratives in the Frame of Performance Theory]. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp.51 – 66. .

¹ Asst. Prof., Mardin Artuklu University, Institute of Living Languages, Kurdish Culture and Language Department. necatkeskin@gmail.com

DESTPÊK

Edebiyata gelêri an jî wek carinan tê binavkirin 'edebiyata devkî' beşeke sereke ya folklorê tê hesibandin (Dorson 1972: Yıldırım & Pertev & Aslan 2013). Edebiyata gelêri ku wek taybetmendiyêñ xwe yên anonîm û kolektif di nav civakê de tê afirandin û dîsa di nav şert û mercen civakê de bi nifşen nû re tê veguhastin, di çanda civakekê an jî heremekê de roleke gelekî bingehîn dilîze. Bi vî rengê xwe ji aliyekî ve rewşa civakê dide ber çavan û ji aliyen din ve jî fonksiyonekê di nav civakê de tîne cih. Bêguman li gor guhertinê şert û mercen jiyanê folklor û wek binbeşeke wê edebiyata gelêri jî rastî guhertinan tê. Di heman demê de ji aliyê bikaranîn û fonksiyona hêmanen edebiyata gelêri jî guherîn derdikevin meydanê. Ev guherîn dibe ku di ziman de, di 'gotin'ê bixwe de û di 'icra'kirinê de were xuyakirin.

Îro her diçe ji aliyê teknolojî û her weha ji aliyê ragihandinê ve gesedanek berfireh çêdibe û ev yek jî bi xwe re hem ji aliyê xebat û hem jî ji aliyê bikaranîna encamên van xebatan de derfetên nû derdixîne meydanê. Ji aliyê xebatên folklorê ve jî ev pêşketin û gesedan gelekî girîng in. Hem ji bo agahdariya girseyan û di heman demê de jî ji bo xebatên folklorî û bikaranîna vegotinê gelêri derfetên nû bi xwe re tîne. Di nav van derfetan de bikaranîn, 'pêşkêşkirin' û fonksyonen 'nû' yên xebatên folklorî di çarçoveya nêrîna performansê de dikarin werin nirxandin. Her weha vegotinê edebiyata gelêri ya kurdan jî di çarçoveya bikaranîn, 'pêşkêşkirin' û fonksyonen nû de dikarin werin analîzkirin. Lê pêşî pewîste çend gotin li ser têkiliya edebiyata gelêri û folklorê, cihê edebiyata gelêri di nav teoriyên folklorê de bê gotin.

1. Folklor û edebiyata gelêri:

Folklor beşeke zanistê ye ku bi gelempêri dikare wek lêkolîn, polînkirin, arşivkirin û şirovekirina çanda gelekî, an jî çanda herêmekê bê pênasekirin (Örnek 2000:15). Di bin banê vê beşa zanistî de 4 binbeşen girîng têñ diyarkirin ku yek ji wan edebiyata gelêri (folk literature) an jî edebiyata devkî (oral literature) ye.

Li gor Dorson (1972: 2-5) folklor di bin çar binbeşan de dikare were dabeşkirin. Ev jî;

1-Edebiyata devkî/gelêri (Oral Literature): Berhemên ku nivîskarê wan ne diyar û bi awayekî devkî belav bûne. Hemû cureyên edebiyata gelêri di nav vê beşê de têñ tomarkirin.

2- Çanda madî: Ev ji teknîk, bikêri (skill), formûl û tarîfêñ ku ji nifşan bo yên din hatine veguhastin.

3- Adetên gel ên civakî: Rîtuelên derbasbûnê (initiation rites), adetên têkildarî jidayikbûn, zewac, mirin di nav vê beşê de têñ tomar kirin.

4- Bicihanîna (performing) hunerên gelêri wek muzîka gelêri, dans û şanoya gelêri cureyên vê beşê ne.

Di nav xebatê folklorê de edebiyata gelêri cihekî girîng digire û saheyeke berfireh e. Carinan wek 'çanda devkî' jî tê binavkirin, lê di navbera çanda devkî û edebiyata gelêri de cudahiye heyen. Ligel ku edebiyata gelêri, wek ji nav jî diyar e, hêmanên 'edebî' di nav xwe de dihewîne, 'çanda devkî' tê wateya hemû tiştên ku bi awayekî devkî heta îro hatine (Ong 1995).

Ev tesnîf carina jî wek 'çanda madî' û 'çanda manewî' jî tê binavkirin. Lê îro ji dêvla van binavkirina ve bêhtir 'mîrata şenber ya çandî' û 'mîrata neşenber ya çandî' tê bikaranîn. Ev dabeşkirin û binavkirin di nivîs û belavokên UNESCO de jî tê xuyakirin û beşa ku 'edebiyata gelêri di nav de wek 'mîrata neşenber' tê pênasekirin.²

Edebiyata gelêri ku parçeyek ji 'mîrata neşenber' e di çanda hemû gelan de cihekî sereke digire. Ew hemanên edebî ku nivîskarê wan ne diyar e û di nav gel de bi awayekî 'anonîm' hatine heta îro di bin banê edebiyata gelêri de dikarin werin kom kirin û ew jî dîsa dikarin di bin du besên sereke de werin dabeşkirin:

1-Vegotinê gelêri

2-Şîira gelêri (gotinê stranê gelêri û dûrik jî dikarin di bin vê beşê de werin dabeş kirin).

Vegotinê gelêri jî ji mît, destan, efsane, hikayeyên gelêri, çîrok, gotinê pêşîyan, biwej (îdiyom) û tiştanokan pêk tên (Karadağ 2004).

Berî ku nimûneyên vegotinê gelêri yêndi kurdî di çarçoveya bikaranîna wan ya îroyîn de were niqaş kirin, bi kurtasî divê di nav dîroka folklor û teoriyên wê de nêrînek li edebiyata gelêri were kirin.

1.1. Di nav teoriyên folklorê de vegotinê gelêri:

Xebatê folklorê bi awayekî zanistî bi birayê Grimm re dikare were destpêkirin ku di nav van xebatan de jî xebatê li ser vegotinê gelêri cihekî sereke digirtin. Birayê Grimm ji çîrok, destan û mîten gelêri yêndi nav gel de belav bûne dest bi karê xwe yê berhevirkirinê kirin. Li gor wan ew 'rihê gel' di nav van vegotinê gelêri de dikaribû were dîtin.³ 'Rihê gel'

² Ji bo pênaseya 'mîrata çandî' ya UNESCO bnr: <http://www.unesco.org/culture/ich/en/what-is-intangible-heritage-00003>; û ji bo pênaseya 'mîrata neşenber' jî bnr: <http://www.unesco.org/culture/ich/en/convention#art2-diroka-lenernê> ya dawî: 11.12.2015.

³ Ev yek rasterast bi fikra netewî ve girêdayî ye. Li gor wê demê ku wek 'demâ romantîk' jî tê binavkirin, bingeha 'netewe' an jî 'rihê netewe' di nav gel bixwe de ye û dibe were berhevirkirin. Ji bo têkiliya 'folklor û netewîti'yê bnr: Arzu Öztürkmen (1998), Folklor ve Milliyetçilik. İstanbul: İletişim.

yen ji fîkrê filozofê Elman Johann Gottfried von Herder bû ku bandor li ser Birayê Grimm û fikra netewetî ya Elmanan kiribû.⁴

Piştî pênasekirina 'folklore' û pejirandina têgehê ji aliyê raya giştî ya akademiyê ve, sazî û weşanê derbareyê xebatê folklorî jî zêde bûn û pê re jî nêrîn û teoriyê vê beşa zanistî jî derketin meydanê.

Folklor jî, bêguman, wek beşeke zanistî girêdayî rewş, nêrîn û niqaşen demê yên ku di akademiyê de têne pejirandin û xebat jî li gor rîbaza van nêrîn an jî teoriyan bi rî ve diçe. Ev yen di pênasekirin, bikaranîn û xebatê folklorê de -hem ên teorîk û hem jî yên saheyî- tê xuyakirin.

Piştî binavkirin û bikaranîna têgeha 'folklor'ê, xebatê di vî warî de jî bêhtir bi rîkûpêk bûn, sazî û kovarêni bi navê folklorê hatin sazkinin û weşandin û ev xebatê ku bi 'rihê gel' ve girêdayî û dihat bawerkirin ku bingeha avakirina 'netewe' ye, di nav gelên ku dixwestin nasnameya xwe ya netewî xurttir bikin de berfirehtir bûn.

Ligel ku ji aliye kî ve xebatê folklorê bi vî rengî bimeşin, ji aliyê din ve xebatê li ser teorî û rîbazên folklorê jî dihatin kirin û ev yen jî piranî girêdayî şert û mercen civakî, zanistî, çandî û siyasî bûn. Ji ber vê yenê jî teoriya pêşî ku bandora xwe li ser xebatê folklorî kiriye, nêrîna giştî ya wê demê peresenparêzî (evolutionarism) ye.

Wekî tê dîtin, xebatê folklorê ku bêhtir li ser vegotinê gelêri⁵ dirawestiyan bi xebatê qadî destpêkirin û di nav wan de jî berhevkirin rîjeyeke gelekî giran digirt û ev berhem an jî xebat jî bêhtir bi şêweyeke dîakronik (diachronic)⁶ dihatin nirxandin.⁷ Ev yen bi du nêrînen sereke ve girêdayî bû; yen jê peresenparêzî û ya din jî neteweperwerî. Wek mînak çavkaniyê eslî yên vegotinê gelêri, koka wan, bê ji ku û çawa derketine mijarêni eslî yên vê demê bûn û her weha jî nêrîn û toeriyê wê demê jî li ser vê bingehê hatibûn damezrandin.

Nêrîn an jî rîbaza 'dîrokî-erdnîgarî ya Fînî' û 'teoriya dîrokî' dudu ji van teoriyan in ku bêhtir li ser 'kok' û 'dîroka' vegotinê gelêri disekinin.⁸

Bêguman wek li jor jî hat gotin ev ramanêni di folklorê de ji nêrînen giştî yên zanistên civakî û şert û mercen siyasî, çandî û civakî ne dûr bûn û bi wan re têkildar bûn. Her weha xebatê li ser 'kok' û 'dîrok'a keresteyê folklorê dirawestiyan jî bêhtir di bin bandora peresenparêziyê (evolutoniarism) de -teoriya serdema 19mîn ya giştî di zanistên civakî de-

⁴ Ji bo teoriya Herder ya 'rihê gel' (volksgeist) bnr: <http://www.counter-currents.com/2011/05/herders-theory-of-the-volksgeist/print/> -dîroka lênerînê: 09.10.2015.

⁵ Vê yenê bandor li ser pênaseya têgeha 'folklor'ê bi xwe jî kir ku wextekî gelekî dirêj folklor û edebiyata gelêri di heman wateyê de hatin bikaranîn. Ji bo pênaseya folklorê ya pêşî bnr: Richard M. Dorson-William J. Thoms (1997).

⁶ Ji bo 'diachronic' di kurdî de pevv tune ye, di nav ferhengêng ingilizî-kurdî jî ev pevv me nedît. Her çiqasî wek 'xebatê paşdeçuyî' an jî 'dîrokî' werin bikaranîn jî, ji bo niha me wek 'diakronik' nîvisand.

⁷ Özkul Çobanoğlu, Sözlü Kompozisyon Teorisi ve Günümüz Halkbilim Çalışmalarındaki Yeri, Folkloristik, 1998, ankara.

⁸ Aslan (2012: 85) van teoriyan wek 'teoriyê metîn-navendî' binav dike ku yen ji wan' ekola fînî ya dîrokî-erdnîgarî' ye din jî 'ekola binyadgerî' ye.

bûn.⁹ Ji aliyê din ve wek diyardeyek civakî fikra neteweperwerî jî her diçû ges dibû û vê yekê jî bandor li ser xebatê folklorê dikir.

Bêguman, guherînê di civakê de bandora xwe li zanistê jî dikir û di nav demê de bi guherînê civakî re nêrîn û teoriyên zanistê civakî jî xwe adapteyî van guherînan kirin.¹⁰ Her weha nêrînê di beşeke zanistê de jî bandora xwe li besê din dikir/dike. Folklor jî wek beşek ji zanistê civakî ji van guherînan bêpar nema û nêrîn û teoriyên cuda di vê qadê de jî derketin meydanê.

1.2. Teoriya performansê û vegotinê gelêri:

Pêşfîkrêni teoriya performansê dikarin di nêrînê antropologên serê sedsala 20mîn ên wek Edward Sapir û Bronislaw Malinowski de werin dîtin. Lê bêhtir bandora 'zimannasiyê' ku di salê 1920an bi pêş dikeve û bi navê 'Dibistana Zimannasiyê ya Pragê' tê zanîn xuya dike. 1960-70an de jî di xebatê folklorê de derdikeve pêş ku ev yek bi xwe bi rewşa civakî ya wê demê, eleqeya ciwanê wê demê ku wek 'nifşa hippî' tên zanîn ve têkildar xuya dike (Çobanoğlu 2012: 292-293).

Piştî salê 1960î di folklor û etnografiyayê de nêrîn ji berhevkirin û kategorîzekirinê ber bi sentez û famkirina gelan û afirandinê li gorî fama wan ve hate guhertin (Magoullick, 2015). Ev nêrîn û guhertin, ligel her tiştên din, ji bo teoriya performansê di folklorê de bû bingehek. Ji wê demê û bi vir de nêrînê folklorzanen ji 'text'ê (metin) ber bi 'context'ê (kontekst) ve guherîn. Êdî bêhtir li ser 'icrakirin'a vegotinê gelêri dihat rawestin. Ev yek bêhtir wek nêrînê 'kontekstî' an jî performansê hatin naskirin. Heta wê demê berhevkirin jî di nav de xebatê folklorî bêhtir li ser 'metinê' (text) disekinîn. Wek Aslan (2012:85) jî tîne ziman;

"Heta iro, ne xelet e go were gotin ku bingeha xebatê li ser çîrokêni ji derdora çanda devkî hatine berhevkirin û derbasî nivîsê bûne bêhtir teoriyên metînnavendî, wek 'Ekola Fîni ya Dîrokî-Erdnîgarî' û 'Rêbaza (Morfolojîk) Binyadgerî', kirine".

Lê belê piştî vê nêrînê êdî bal ji metnê bêhtir diçe ser 'icra' û 'pêşkêşî'ya hêmanê folklorî. Nunerên vê nêrînê wek nimûne ji berhevkirina çîrokêkê bêhtir giringî didin ser çîrokbej, jest û mîmîkêni wî/ê, derdora vegotinê, peyam û bandora wê vegotinê li ser derdorê.

⁹ Ji bo teoriyên zanista civakî bnr: S. Özbudun & B. Şafak & N. S. Altuntek (2007) Antropoloji: Kuramlar/Kuramcılar. Ev xebat her çiqası ji bo 'antropoloji'yê be jî, ji ber ku antropolojî, etnolojî û folklor besê bi hev re gelek têkildarin dikare fikrekî ji bo xebatê folklorê jî bide xuya kirin. Ji xwe derketina teoriya performansê di xebatê folklorê de jî îlhamê ji bi xebat û nêrînê antropologan distîne. Bnr: Özkul Çobanoğlu (2012:288-289).

¹⁰ Ji bo teoriyên folklorê bnr: Richard M. Dorson (1972), 'Concept of Folklor and Folklife Studies' Folklor and Folklife, an Introduction (ed. Richard M. Dorson), The Universtiy of Chicago Press: Chicago, r. 1-50. Bi Özbudun û ed.(2007) re berawird bikin.

Bi gotineke din, nûner û alîgirêñ vê teoriyê êdî ji metnê bêhtir bal didin ser bikaranîn, afirandin û pêşkêşkirina hemanêñ folklorê û bi vê yekê di civakê de fonksiyona folklorê derdixin pêş (Ersoy 2004).

Bi vê nêrînê re êdî hêmanêñ vegotina gelêri an jî yên 'çanda devkî' ji hêmanêñ ku kevn bûne û bûne fosil derdi Kevin û dîbin hemanêñ ku di nav jîyanê de ji nû ve derdi Kevin têñ nîrxandin. Bi vê yekê jî disiplîna folklorê jî ji wê disiplîna ku bi tişte 'kevnar' re eleqedar dibe derdi keve. Li gor Ruhî Ersoy;

"Ev têgeha ku em behsa wê dikin [yanî performans], ji bo famkirina metnê ji fikra famkirina derdora ku metn lê tê gotin derketiye, bi adaptasyona xebatêñ antropolojî li ser berhemêñ çanda devkî dest pê kiriye û pêşketinan jî şiklê xwe yê îro sitandiye" (Ersoy 2004).

Wek li jor jî hat bilêvkirin, xebatêñ ku bi vê nêrînê têñ kirin ji metinê bêhtir girîngiyê dide îcrakirin, şert û mercen îcrayê û derdorê û xebatêñ xwe bi vî awayî dike. Her weha ev nêrîn unsurêñ wek cihê ku ew berhem tê gotin (îcrakirin), wext, mekan, şewe, nasnameya vebêjer wek kontekst dinîrxîne û van unsurana dixe nav xebata xwe de. Êdî hêmanêñ folklorî, wek nimûne vegotinêñ gelêri, ji çarçoveya 'tiştên kevin' an jî ji kategorîzekirina bermayıyêñ demen kevin derdi Kevin û ji ber ku ev berhem di hafizeya gel de hatine parastin, bi nifşen nû ve hatine veguhastin û ji ber ku ev yek didome jî wek berhemêñ zindî di nav civakê de têñ nîrxandin.

Bi vê nêzîkbuyînê ev nêrîn xwe ji niqaşen li ser 'kok'ê dûr dixe û li ser bikaranîna wan hûr dibe. Di vê çarçovê de vegotinêñ gelêri di her deme de bi riya ku xwe li gor şert û mercen civakê, li gor derdorê (kontekst) û vebêjan biguhere gihajtiye roja me ya îro. Ev yek jî wan ji wê çarçova 'cemidî' û sar derdixe û bi awayekî din wek tiştekî ku diherike derdixê ber çavan. Ev nêrînen ku heta niha di vir de hatine bilêvkirin di gotin û xebatêñ nûner û alîgirêñ 'teoriya performansê' de jî têñ dîtin.

Alan Dundes, ku yek ji sereke folklorzanêñ teoriya performansê ye, li ser pênase û tehlîlkirina berhemêñ folklorê girîngiya tevn (texture), metin (text) û kontekstê (context) tîne ziman û dibeje ku bi van her sê ûnsuran berhemeke folklorê dikare were pênasekirin û tehlîlkirin. Di virde tevn (texture) bêhtir bi taybetmendiyêñ ziman ve girêdayî ye. Metin berhem bi xwe ye. Yanî her vegotinek gelêri, an jî berhemek folklorî bi xwe metin e. Ligel ku tevn nikare bê wergerandin bo zimanêñ din, metin dikare bê wergerandin. Konteks jî şert û mercen derdorê ku berhem tê de tê gotin an jî afirandin, hilberandin (Dundes 1998).

Dîsa gava Dundes xebatêñ folklorê yên dema xwe rexne dike dibeje ku folklorenas bêhtir li ser metnê disekeinin, tevn bi zimanzzan ve berdane û kontekst jî hatiye paşguhxistin.

Ji aliyê din ve her çiqasî di heman cihî de Dundes bibeje ku kontekst û fonksiyon dibe ji hevdu werin cudakirin jî, dikare were gotin ku fonksiyona berhemeke folklorî girêdayî konteksê ye û li gor konteksê jî diguhere.¹¹

Xebatê folklorê ku îro tê kirin, an jî xebatê folklorî ku li ser malperan, li ser dikê şanoyan, an jî di televizyon û muzeyan de tê 'pêşkêşkirin' jî di vê çarçovê de dikarin werin nîrxandin. Çirok, pêkenok, çirokênen gelêri û heta gotinê pêşîyan careke din, 'ji nû ve' tê bikaranîn, di civakê de fonksiyonekê bi kar tînin.¹²

Edebiyata gelêri ya kurdan û bikaranîna berhemên wê di dema îro de hem ji aliyê fonksiyon û hem jî ji aliyê bikaranîne de dikarin di vê çarçoveyê de werin analîzkirin.

1. Ji nû ve 'bikaranîn'a vegotinê gelêri:

Ji bo ku 'jinuvebikaranîn' were famkirin divê pêşî bersiva vê pirsa sereke were dayîn: Xebatê folklorî ji bo ci tê kirin? Ji bo ci keresteyê folklorî tê berhevkirin, tesnîfkirin, arşîvkirin û şirovekirin?

Wek her beşeke zanistê û zanistê civakî jî, armanca xebatê folklorê jî di serî de 'famkirina' derûnî, binyada civakî ya gelekî an jî heremekê ye, û di vê çarçovê de dîsa famkirin û têgihiştina têkiliya wî bi paşerojê ve, bi erdnîgarî, siruşt û derdora wê ve ye. Ji bili vê armanca sereke, hinek tiştê din hene ku xebatê folklorê girîngiyê didin ser û wek armancê ji xwe re nîşan dikan. Ew jî bi vî awayî dikarin werin amajekirin;

-Naskirina çanda 'xwe' (berhevkirin û tesnîfkirin)

-Parastina çanda 'xwe' (arşîvkirin)

-Danasîna çanda 'xwe' (şirovekirin).

Êdî ev çanda ku hatiye 'naskirin' û 'parastin' divê bi nifşen nû ve were veguhastin ku ew jî di çarçoveya 'jinuveşirovekirin' de dikare were xwendin û dîsa di vir de perwerdehiya zarokan an jî bi gişî perwerdehî jî di nav vê yekê de cih digire. Ev xala dawî wek li jor jî bi kurtî hat behskirin pêşî bi hişmendîya neteweyê ve girêdayî ye. Êdî 'çand'a ku hatiye 'naskirin' û 'parastin' di konteksteke 'nû' de, ji bo ku nifşen nû 'çanda xwe ji bîr nekin û hîn bibin', bi

¹¹ Dîsa Dan-Ben Amos jî folklornamekî parezvanê vê teoriyê tê naskirin. Xebata wî bi navê 'toward a folklore definition in to context' (1971) girîng e. bnr. Ben-Amos (1971).

¹² Di serdema me de tişa herî sereke ku di nav jiyana me de cih digire internet û teknolojî ye û ev yek wek her tişti bandorê li vegotinê 'gelêri' jî dike. Ji bo xebatek nû li ser vê mijarê di derbarê 'gotinê pêşîyan' ên tirkî û 'guherîn' wan bnr. Uğur Başaran (2013), "Atasözlerinin Kalıpsallığı Üzerine", *Turkish Studies*, Volume 8/9 Summer 2013, s. 760. Ji vê xebatê mînakek dê mebestê rave bike. Gotineke pêşîyan ya tirkî 'ayni ip'te iki ayı oynamaz' (li ser heman werîşî du hîrc nalîzin) îro li ser malperên internetê bi awayê 'Aynı ip'de iki bilgisayar oynamaz' (Di heman ip'de di compûter naxebitin) belav dibe û tê bikarinîn.

şêweyeke nû tê pêşkêşkirin, 'îcrakirin' an jî şirovekirin.¹³ Perwerdeya zarokan jî ku dikare wek armanceke din ya xebatê folklorî were gotin, bi xwe bi performansê (îcrakirin) ve têkildar e.

Di vir de berî ku em derbasî mînakênd kurdî bibin hinek mînak ji derdorê dê mebest û hizra gotarê zelaltir bike. Bêguman di vê mijarê de gelek mînak hene ku werin dayîn. Ji lîstikênd gelêri ku bi awayekî 'nû' û 'standartîzekerî' heta şanoya gelêri, bikaranîna çîrokan di sînema û televîzyonê de yelpazeyek gelekî berfireh heye. Ji aliyêndin ve di şanoyêndi bo zarokan de jî mînakênd zêde hene û gelek caran jî çîrok bi awayekî 'nûjen' tênd pêşkêşkirin.¹⁴ Lê li vir sê mînak jî ji bo mebesta vê gotarê dê bes bin.

Mînaka pêşî bernameya 'Uykudan Önce' (Berî Xewê) ya TRTyê ku di salê 1980yî de dest pê kiri bû ye. Ev bername ji aliyê şanoger û lîstikvana sînemayê Adile Naşit ve di TRTyê de dihat pêşkêşkirin. Di bernameyê de Adile Naşit¹⁵ wekî 'xalтиya çîrokbêj' (Masalcı Teyze) dihat binavkirin û berî xewê wek pîrikên çîrokbêj ên berê ji zarokan re çîrok û mesele digotin. Lê di demê berê de têkiliye rû bi rû hebû bi guhdaran re, lê di bernameyê de ev yek hatiye guhertin û êdî têkiliya 'vebêjer' û 'guhdarvan' bi şêweyeke ne rasterast pêk tê. Her çiqasî di vir de têkiliya metn (text) û kontekstê (contekst) hatibe guhertin jî fonksiyona ku di civakê de bi kar tîne nehatiye guhertin û di ser de jî bi riya televîzyonê ev 'sînor'ê vê bikaranînê firehtir buye. Êdî 'xalтиka çîrokbêj' ne ew pîrika ku li malê ji sê-çar zarokan re çîrokan dibeje an jî şîretan li wan dike, lê ew bi riya bernamê dibe 'xalтиka çîrokbêj' ya hemû zarokan. Ji aliyêndin ve bi vê yekê çand ji nû ve tê zindîkirin û zarok dîsa bi riya vê bernamê û 'xalтиka çîrokbêj' çanda ku di nav de dijîn nas dikin.

Mînakeke din ya balkêş dîsa ji Tîrkiyê 'Mûzeya Mîrata Çanda Neşenber' (Somut Olmayan Kültürel Miras Müzesi) ya li Enqerê ye.¹⁶

Ev muze di sala 2013an de bi hevkariya beşa 'Gelnasiya Tîrkan' (Türk Halkbilimi) û şaredariya Altındağ ya Enqerê ve hatiye vekirin. Wek ji navê wê jî tê famkirin ev muze ji muzeyênd ku berhemên dîtbar di hundirê wan de tênd pêşkêşkirin cuda ye û bêhtir berhemên ji 'çanda devkî' an jî 'çanda neşenber' tênd pêşkêşkirin'. Karagöz-Hacivat, cureyên şanoya gelêri (orta oyunu, meddah) û lîstikênd zarokan, hinek ji lîstikênd gelêri ne ku di vê muzeyê de pêşkêşî mevanan tênd kirin. Dîsa hunerênd gelêri wek 'Ebrû' jî di vê muzeyê de bi mîvanan re tê tetbîqkirin. Ji aliyêndin ve cureyên edebiyata gelêri wek çîrokênd Enqerê û yên deverên din,

¹³ Her çiqasî ev bi hişmendiya netewî ve girêdayî be jî, divê aliyê wê yî 'mirovahî' neyê paşgûhxistin û neyê jibîrkirin. Ji ber ku her mirov, bi giştî jî zarok, bêhtir bi zimanê xwe yên dê û bavan, bi çanda ku di nav de mezîn dibe, bi motîfîn çanda xwe dikare hîn bîbe û dînyayê nasbike.

¹⁴ Ji bo şanoya zarokan mînakeke guncav 'Mîhrîcana Navnetewî' ya Şanoya Zarok û Ciwanan ya Mêrdîn'ê (Uluslararası Mardin Çocuk ve Gençlik Tiyatro Festivali) dikare were nîşan kirin. Di navbera 03-08ê Cotmeha 2015an de ya 6mîn hat lidarxistin. Hem di bernameya 2015an hem jî di bernameyênd berê de lîstikênd ji çîrokan hatine wergirtin cih digirin. Ji bo agahiyê berfireh bnr: <http://mardintiyatro.org/festival-2015/>; û <http://mardintiyatro.org/wp-content/uploads/2015/11/MardinKatalog-2015-dijital.pdf> -dîroka lînêrinê: 20.12.2015

¹⁵<http://www.sinemavesinema.com/adile-nasit-vefatinin-28-yılında-sevenleri-tarafından-anıldı-c3237.html>; Ji bo jiyana Adile Naşit bnr: https://tr.wikipedia.org/wiki/Adile_Naşit dîroka lînêrinê: 20.12.2015

¹⁶Ji bo agahiyê berfireh derbarê mûzeyê de bnr: <http://www.kulturelmirasmuze.com/index.php>; http://turk_halkbilimi.gazi.edu.tr; <http://www.ankarakultur.gov.tr/servisler/kultur-ve-tabiat-varliklari/muzeler/somut-olmayan-kulturel-miras-muzesi> -dîroka lînêrinê: 15.11.2015

gotinê pêşîyan, stran, lorî di vê muzeyê de careke din ji mîvanan re û bi wan re têngotin, an jî 'pêşkêşkirin'. Îdî ev hêmanê çanda neşenber ku ji sedsalan gihaştine roja îro bi awayekî din û bi wateyeke din têngotin dubarekirin û bi vî awayî jî nifşen nû van berhemê gelêri nas dîkin û her weha zarokênu ku vê derê ziyaret dîkin hînî çanda xwe dîbin an jî bi riya çîrokan 'perwerde'yekê distînin.

Bi gotineke din, ji aliyekî ve muze karê xwe yê sereke yanî parastin û danasîna çandê dike û ji aliyekî ve bi rîyeke din, bi şeweyleke din van berhemê 'çanda neşenber' ji nû ve dihilberîne. Yanî metn (çîrok, lîstik hwd.) di nav kontekseke nû (di muzeyê de) bi tevneke cuda (ji hêla kesen ku li wir dixebeitin) ji nû ve têngotin hilberandin. Wek mînak, mîvanan ku têngotin odaya ku Karagöz-Hacivat tê pêşkêşkirin dikevin nav kontekseke din de. Li vir êdî ne tenê temashêkirin lê ji aliyê din ve tevlîbûn jî pêk tê. Ci zarok, ci mezin kesen ku dikevin vê odê de bi awayekî tevlî lîstikê dîbin. Ya li zengil dixin, ya vekirina lîstikê dîkin û dilîzin ku ev bi xwe performanceke nû ye ku li ser emprowîzasyonekê tê avakirin.

Zarok an jî mîvanan ku dikevin odaya çîrokan de jî bi heman rengî dikevin nav kontekseke din de. Li vir êdî ew çîrokbejêni di nav gel de dijîn diçin, çîrokbejêni 'xwende' û çîrokêni 'standart' derdi kevin meydanê. Di besen din ên muzeyê de jî heman tişt dikarin werin dîtin.

Mînakênu ku heta neha hatin dayîn, li gor teoriya performansê ji aliyekî ve ji nû ve zindîkirina folklorê ye. Aslan referans dide folkornas İlhan Bağöz û weha dibeje;

"Tu şewe an jî metnek sabit yên berhemênu ku di hawirê çanda devkî de hatine hilberandin tune ye. Metinê cuda yên van cureyan ku di demen cuda yên îcrakirinê û mîkanen cuda de hatine afirandin hene. Li ser metna ku di her îcrayeke de 'ji nû ve hatiye afirandin', hostatiya vebêjer ya di îcrakirinê de, asta perwerdehiyê, temen, statuya civakî, baweriyen olî, daraziyen ehlaqî, bi kurtî nasname û şexsiyeta wî/wê bandorê dike, ev ûnsur şekil didin metnê" (veg. Aslan 2012: 86).

Ev jî careke din dide xuyakirin ku folklor ne tenê tiştekî ku di paşerojê de cemidî maye, lê li gor dem, derfet û rewşa giştî tiştekî ku ji nû ve tê 'afirandin' an jî bikaranîn. Ji ber ku kesen ku dibêje, kesen ku guhdar dike û metin yanî (vegotin) bi xwe tê guhertin.

Çîrokêni ku di televîzyonan de têngotin jî di heman çarçovê de dikarin werin nîrxandin. Wek di mînaka jor de hat dîtin (Uykudan Önce) vebêjer, têkiliya vebêjer û guhdarvanan, rewşa ku tê de çîrok têngotin tev hatine guhertin û êdî bi şeweyleke din û bi wateyeke din vegotin careke din 'têngotin afirandin'.¹⁷ Heman tişt ji bo çîrokêni ku wek 'xêzel-film' têngotin 'pêşkêşkirin' an jî gotin jî dikare were gotin. Îdî di van bernameyan de 'çîrokbej'

¹⁷ Li vir careke din divê were gotin ku bi riya televîzyonê hêmanê edebiyata gelêri ji hêla bêhtir kesan ve têngotin 'guhdarkirin'. Bi vê yekê jî bêhtir kes, piranî jî nifşen nû çanda 'xwe' nas dîkin ku ev yek van berhemê edebiyata gelêri bi 'wate' dike.

televîzyon bixwe ye, û çîrok ne ku tê guhdarkirin lê tê temaşekirin. Berî ku ji bo çîrokên kurdî mînak bêñ dayîn, mînakek ji derve dê mijarê hinekî zelaltir bike.

CN (Cartoon Network) qenaleke televîzyonê ye ku li ser satelaytê weşanê dike. Zimanê wê jî bêhtir bi ingilîzî ye. Bernameyên televîzyonan jî bêhtir ên ji bo zarokan li welatêñ din ji çanda wan tê û gelek caran jî ji edebiyata gelêri, ji çîrok û hikayeyên gelêri pêk têñ.

Di vê qenalê de her çiqasî bêhtir 'çanda ingilîzî' û lehengêñ (kevin û nû) yên wê çandê têñ pêşkêşkirin, carinan jî ji çandêñ cihanê jî mînak têñ dayîn. Yek ji wan ku îro di bernameya CN (Cartoon Network)ê de cih digire jî çîrokên 1001 şevê ne. Ev çîrok wek anîmasyon an jî 'xêze-film' di bernameyê de têñ pêşkêşkirin. Lî wek ku di vir de jî tê dîtin, û wek ku di 'nêrîna performansê' de jî tê diyar kirin, çîrok bi awayekî din tê gotin û ev yek jî careke din dide xuyakirin ku her gotinek 'jinûvegotin'e. Di vê xêzefilma bi navê 1001 şevê de çîrokbêj wek di weşanê de jî 'Şehrazad' e, yên ku ji wan re têñ gotin jî 'Şehrzaman' û dunyazad' in. Her du jî, bêhtir jî 'Şehrzaman' di vê bernamê de wek zarokekî 'netebte' tê xuyakirin, û 'Şehrazad' ji bo ku şîretan bide wan çîrokan ji wan re dibeje.

Di wir de, çîrokên 1001 şevê ku mîrateke ji rojhilata navîn e, bi hinek guhertinêñ biçûk têñ bikaranîn û ev yek jî bala zarokan dikişîne û wan bi çanda Rojhilata Navîn dide naskirin.¹⁸ Ev yek jî ji bo 'jinûvebikaranîn'a vegotinêñ gelêri û teoriya performansê mînakeke balkêş e.

2. Vegotinêñ gelêri yên kurdî û performans:

Piştî van mînakan gelo vegotinêñ gelêri yên ji folklorâ kurdî çawa 'ji nû ve têñ bikaranîn'? Gelo di nava konteksa nû de bi ci şêwe û wateyê têñ pêşkêşkirin? Kijan mînak di vê çarçoveyê de dikarin werin nîşankirin? Ev tev de ji aliyekî ve bi rewşa çalakiyêñ kurdan ve girêdayî ne.

Xebatêñ folklorâ kurdî, dikare were gotin ku, her çiqasî di asta berhevkirinê de bin jî xebatêñ analîz, şirove û berawirdiyê jî hêdî hêdî derdikevin pêş.¹⁹ Her weha 'bikaranîn'a wan, an jî 'jinûvegotin'a wan jî êdî xuya dike.

Wek di serî de jî hate gotin, geşdan û pêşketina di warê teknolojî û ragihandinê de bandor li ser xebatêñ medyaya kurdî jî kirine. Dikare were gotin ku di pêşkêşkirina hemanêñ folklorâ kurdî de sazî û amurêñ ragihandinê roleke girîng dilîzin. Di vî warî de kurd jî gelek dixebeitin, televizyon û radyoyan vedikin. Her çiqasî ev radyo û televizyon bêhtir di warê

¹⁸ Di vê bikaranînê de 'sterotîpkirin' jî dikare were niqaşkirin, lê ji ber ku ev li derveyî mijarê yê dê li ser neyê rawestandin.

¹⁹ Wek mînak di pirtûka 'Edebiyata Kurdi ya Gelêri' ku editöriya wê Ramazan Pertev kiriye gotarêñ cur bi cur li ser edebiyata gelêri hene. Gotara Hayreddin Kızıl & Veysel Tanrikulu (2015) ya bi navê "Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdi bi Gur û Heft Karikan a Birayêñ Grimm re" jî di warê berawirdkirinê de wek xebatek nû dikare were nîşankirin.

siyâsî de çalak xuya dikin jî, di demêن dawî de hinek hewldanêن di warê çandê de jî derdikevin meydanê. Îdî çîrokêن gelêri di televîzyonan de têن bikaranîn ku ev yek ji aliyekî tê wateya 'jinûvebikaranîn'a van çîrokan.

Ji aliyê din ve di bin banê şaredariyan de navendê çandê hatine vekirin û li van deran xebatêن li ser çandê, li ser edebiyata gelêri tên kirin, hêmanêن folklorê ji edebiyata gelêri pêşkêşî gel tên kirin. Li vir sê mînak dê werin dayîn ku ji hêla metin, tevn, û kontekstê dikarin werin şirove kirin. Yek ji wan dengbêjî û malên dengbêjan e.

Dengbêjî, di nav civaka kurdan de wek formeke veguhastinê cihekî sereke digire û îro ji hêla kurdan ve bêhtir wek formeke 'netewî' tê nîrxandin. Dengbêj kî ye? Ci dike? Dengbêj ew kes e ku bi dengê xwe rih û can dide serpehatiyêن berê, û wan serpêhatiyân careke din bi dengê xwe -û carinan jî bi alîkariya *bilûra* xwe- di hafizeya çandî ya gel de zindî dike. Ji vê yekê jî tê xuyakirin ku ev wek *bardêñ* Keltan an jî *griotêñ* Efrîkayê barkêşen hafizeya çandî yê di nav kurdan de ne. Bêguman di nav folklora kurdan de ne tenê dengbêjî lê hinek formen din ên veguhastinê, an jî vegotinê hene, lê wek li jor jî hat gotin van salêñ dawî wek formeke 'netewî' tê nîrxandin. Vekirina 'malên dengbêjan' li Diyarbekirê ji hêla Şaredariya Mezin ya Bajêr jî vê yekê dide xuyakirin.²⁰

Dengbêj wek ji peyvê jî tê xuyakirin ji du peyvan pêk tê û tê wateya 'hostayê deng' (Hamelink & Barış 2014).²¹ Dengbêj û dengbêjî heta salêñ 1980yî di nav civaka kurdan de wek kevneşopiyekî cihekî girîng digirt. Ji aliyekî ve pêşketinê teknolojîk, belavbûna radyo û televîzyonan, koça ber bi bajaran, yanî ji ber sedemêñ civakî, çandî û siyâsî ev kevneşopî ber bi windabûnê ve çû. Pişti salêñ 2000î Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê cihek bi navê 'mala dengbêjan' vekir û dengbêjîn ku bêhtir li malan, li ber derê 'camiya mezin' ya Diyarbekirê, an jî li qehwelian şer û serpêhatiyêن berê digotin, wek karmend li wir bi cih kirin. Di vê mînakê de dikare were dîtin ku hem di kontekst û hem jî di tevnê de guherîn çêbûye. Îdî ew metnê berê (şer, serpêhatî hwd.) di kontekst û tevneke nû de 'ji nû ve' tên bikaranîn. Di vê çarçoveyê de têkiliya guhdarvan û vebêjer jî guheriye. Ji aliyê din ve guhdarvanêñ ku hevdu nasdikin an jî têkiliyeke wan bi hevdu re an jî bi dengbêj bi xwe re heye jî ne 'yên berê' ne. Ji hemu çîn û koman cur bi cur mirov têñ li wan guhdar dikin. Ji vî alî ve ev 'çalakî'ya 'nû' bi şêweyeke din, di konteksteke 'nû' de tê 'pêşkêşkirin' ku hemu xalêñ 'nêrîna performansê' ne.

Di heman çarçovê de dîsa lîstika şanoyê ya 'Şanoya Bajarê Mezin a Diyarbekir' a bi navê 'Mem û Zîn' ku ji epôsa 'Memê Alan' hatiye adabtekirin jî wek mînakeke din dikare werê dayîn. Ev şano di sala 2014an de li Qesra Mala Cemîlpaşa ku wek 'muzeya bajêr' tê bikaranîn hat 'pêşkêşkirin'. Di vê pêşkêşkirinê de dîsa tê dîtin ku metin, tevn û kontekst bi awayekî 'nû' hatiye bikaranîn. Îdî li Diyarbekir, di 'muzeya bajêr' de 'Memê Alan' tiştekî din ji guhdarvanêñ xwe yên 'nû' re dibêje.

²⁰ Ji bo formeke din û berawirdiya wê bi dengbêjiyê re bnr. Necat Keskin (2015a). Tûr-Abdin'de Bir Kimlik ve Anlatım Biçimi: Mitürbalar ve Mitriplik. *Folklor/Edebiyat*, c. 21, sayı.84, (2015/4), r. 57-72.; (2015b). Mitirb û Mitirbî: Nasname û Vegotin. *Wêje û Rexne*, hı. 6, r. 109-120.

²¹ Ji bo pênaseya Dengbêjî û cihê wê di muzîka kurdi de bnr. Mehmet Uzun (2001) û Erol Mutlu (1996).

Jî hêla 'jinûvevegotin' an jî 'bikaranîna vegotinê gelêri de mînakeke din jî ya îroyîn televizyona bi navê 'Zarok.tv' ye. Zarok Tv di sala 2015an de dest bi weşana fermî kiriye. Wek ji navê wê jî tê xuyakirin ji bo zarokan e û tê de bernameyên zarokan hene. Lê her çiqasî bi kurdî jî be anîmasyon û xêze-filmên wê ji çanda kurdan dûr û bêhtir ji derve ne. Wek mînak tê de 'Şînok', 'Rêzikên Angelo', 'Mêşhingiv Maya', 'Mala Foster', 'Gumball', 'Sifinc Bob', 'Pocahontas' ku hemû ji çand û 'çîrok'ên derve ne tê de cih digirin. Sedemên vê yekê piranî madî û teknolojîk û nebûna van bernameyên bi kurdî ye.²² Lê dîsa jî ji aliyê 'danasîna' çandê ve tiştên 'xwemalî' wek 'Zarokîstan', 'Fêrgeh', 'Hunerên Destan' jî xuya dikan. Her weha ji bo çîrokên gelêri jî bi navê 'hebu tune bû' bernameyek he ye ku bi ya 'İyi Uykular' (xew xweş) ya tirkî ku wek mînak li jor hatibû dayîn he ye. Dîsa wek heman mînakê 'Hebû Tune bû' jî her roj di saeta 21.00an berî xewan derdikeve pêşberê zarokan. Di vê bernameyê de lîstikvan xwe xistiye dirûvê pîrekî û ji zarokên derdora xwe re çîrokan dibêje. Tiştên ku li jor di çarçova teoriya performansê de ji bo 'iyi uykular' hatibû gotin, ji bo vê mînaka kurdî jî derbasdar e. Di vir de jî, dîsa tê dîtin ku metin (çîroka standartîzekirî), kontekst (mekanê ku çîrok lê tê gotin an jî performans tê kirin) û tevn ku bi her du xalan ve girêdayî ye hatiye guhertin.²³

Di çarçoveya mijarê de mînakeke din dikare were nîrxandin ku girêdayî 'şanoya zarokan' û bikaranîna çîrokên gelêri di şanoyê de ye. Hem ji ber ku di nav de 'tevger'ek heye û hem jî ji ber ku 'ji nû ve tê gotin' ev mînak ji bo mijara vê gotarê muhim e. Di vî warî de ji bo bikaranîna çîrokên gelêri yêndezîne kurdî zêde mînak tune ne. Yek ji wan jî 'şanoya bi navê 'Zimzim' e ku li Mêrdînê xebatêñ xwe didomînê. Li gor yek ji damezrînerên wê, Bilal Korkut, şano di 2014an de ligel çend hevalan ji bo zarokan tê avakirin. Di sala 2015an de jî çîroka bi navê 'Pîrê û Rovî' lîstine.²⁴

Di 'pêşkêskirin'a çîrokan de, hemû armancêñ folklorê ku li jor hatibûn rîzkirin (danâsîn, parastin, perwerde) dikare were dîtin. Ji bo zarok û çîrokan ev yek bêhtir derdikeve pêş. Wek Korkut dibêje;

"Çîrok û zarok du hêmayêñ bi hev re giredayî ne. Me jî hewl da ku em wan her du hêmayan di yek beroşê de cardin bikelêñin" (Bilal Korkut, 2016)

Di vê çîroka ku li ser dikê bi awayekî tevgerî tê 'gotin' êdî forma xwe jî diguhere û dibe 'vegotineke nû'. Yanî, "her karekter ji çîrokê derdikeve ser dike û çîrokê zindî dike. Çirok zêdetir gotin e, lê ku derdikeve ser dike ji gotine behtir dibe tevger" (Bilal Korkut, 2016).

²² Di vir de tiştê ku dikare were rexnekirin ew e ku ji bo kurdî û zarokên kurdan ev bername gelekî kêm in û divê bêhtir werin çêkirin. Bêguman sedemên vê yekê gelek in ku dibe mijara gotareke din û ji ber vê yekê jî tenê bi vê rexnê em dê bihêlin.

²³ Ji bo bernameyên Zarok tv û nemaze ji bo 'hebû tune bû' bnr: <http://zaroktv.com.tr/Kurmanci/Program/Heb-tune-b-dîroka-lênerînê ya dawî:19.01.2015>

²⁴ Agahiyêñ derbarê Şanoya Zimzim û xebatêñ wê ji damezrînerê wê Bilal Korkut hatine sitandin. Hem bi riya hevdîtin û hem jî bi riya e-maîlê ev agahî hatine bidestxistin. Hevdîtin li Mêrdînê di 19.01.2015an de hatiye kirin. Bilal Korkut, di van hevdîtinan de, li ser şanoya zarokan ya kurdî jî hinek agahî par ve kirin. Li gor wî heta niha ji bili wan şanoyek bi navê 'Teatra Zîv' çîroka 'Şengê û Pengê' û Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê jî bi zazakî 'Pirê û Luvî' lîstine.

Eger li gor teoriya performansê were gotin, tevna çîrokê tê guhertin. Ji aliyê din, ji ber ku bi awayekî interaktif 'çîrok' tê lîstin, dikare were gotin ku 'kontekst' jî di van mînakan de tê guhertin. Tiştekî din ê balkêş, di 'çîrok'ê de lîstikvan an jî derhêner hinek lîstikên zarakan ên gelêrî dixê nava 'çîroka' xwe ya li ser dikê û di wir de hem lîstikvan û hem jî temâşevan di nav 'çîrokê' de cih digirin. Yanî bi gotina Bilal Korkut, "temâşevan jî dîbin lîstikvan û lîstikvan dîbin temâşevan".²⁵ Ev jî dide xuyakirin ku êdî çîrok ne bi rengê xwe yê 'gelêrî' li ser dikê ye, lê bi rengekî din, bi metineke 'sererastkirî'. Bi gotineke din êdî wek ku di vê mînakê de jî tê dîtin, metineke 'nû', di konteksteke 'nû' de û bi tevneke 'nû' careke din tê gotin. Ji van mînakan jî tê xuyakirin ku vegotinêن gelêrî di nav civakê de bi şeweyleke din, bi 'vegotineke din' careke din xwe zindî dikan.

ENCAM

Di vegotinêن gelêrî de ragihandina di navbera guhdarvan û vebêjer de tiştekî girîng tê dîtin. Bi guherînêن di nav civakê de ev têkilî jî tê guhertin û ev yek jî rengekî nû didê vegotinêن gelêrî.

Vegotinêن gelêrî, ku binbeşeke girîng ya edebiyata gelêrî ye, di nav xebatê folklorê de cihekî sereke digirin. Ji destpêka xebatê folklorê heta îro jî vê mijarê bala gelek folklorasan kişandiye. Ji aliyekî ve berhevkirina wan û ji aliyê din ve jî nirxandinê cuda rê li ber nêrîn û teoriyên cuda vekiriye. Yek ji van teoriyan jî 'teoriya performansê' ye ku hêmanên folklorî -û bêhtir jî vegotinêن gelêrî- di çarçoveya 'icrakirin'ê de dinirxîne. Li gor vê teoriyê êdî divê hemanên folklorê di nav kontekst û tevnê de werin nirxandin.

Pêşketinê teknolojîk, guherînê di civakê de û derfetêن nû rê li ber 'ji nû vegotin'a van hemanên edebiyata gelêrî vedikin. Hêmanên ku hatine berhevkirin êdî li ser dikên şanoyan, di televizyonan û di muzeyan de 'ji nû ve têن vegotin' û têن pêşkêşkirin ku têkiliya vebêjer û guhdarvan an jî temâşevan ji binî ve diguhere. Ev yek jî tê wateya ku hêmanên folklorî ne tiştên 'kevnar' û 'cemidî' ne, lê diyardeyêن zindî û guherbar ku li gor rewş û derfetêن civakê, li gor pêwistiyêن civakê xwe diguherinîn an jî 'ji nû ve têن vegotin'. Nimûneyêن ku di gotarê de hatin dayîn jî vê yekê didin xuyakirin.

Her çiqasî hîna di destpêkê de be jî, ev yek ji bo hêmanên folklora kurdî jî dikare were gotin. Wek ji mînakêni li jor hatine dayîn jî tê xuyakirin, bi guherînê di civakê û bi derfetên 'nû', vegotinêن gelêrî yên kurdî jî careke din 'ji nû ve têن gotin'. Ji ber vê yekê jî nirxandina wan jî divê ne tenê li gor 'metn'ê, lê belê di heman demê de li gor kontekst û tevna 'nû', yanî bi gotineke din di çarçoveya 'teoriya performansê' de were kirin. Ev yek dê bêhtir rê li ber famkirina binyad û bikaranîna wan ya îroyîn ya vegotinêن gelêrî veke.

²⁵ Ji bo nirxandinek li ser heman lîstikê bnr. Derbarê çîrokê de: <http://diyarnname.com/article.php?Idx=2169> dîroka lînêrînê: 19.01.2016

ÇAVKANÎ

- Aslan, F. (2011). İstanbul'da Bir Sene Birinci Ay Tandırbaşı Adlı Kitapta Yer Alan Masalın Performans Teoriye Göre İncelenmesi Üzerine Bir Deneme. *Türk Dili Ve Edebiyatı Dergisi*, 2011-1, 83-140.
- Başaran, U. (2013). Atasözlerinin Kalıpsallığı Üzerine. *Turkish Studies*, 8/9, 757-770.
- BaşGöz, İ. (1988). Masal Anlatıcısı. *Masal Araştırmaları/Folktales Studies I, İstanbul*, 25-29.
- BaşGöz, İ. (2001). Sözlü Anlatımda Ara Söz: Türk Hikaye Anlatıcılarının Şahsi Değerlendirmelerine Ait Bir Durum İncelemesi (çev. Metin Ekici). *Milli Folklor*, Yıl: 13, Sayı: 50, 86-104.
- Ben-Amos, D. (1971). Toward a Definition of Folklore in Context. *The Journal of American Folklore*, vol. 84, no.331, 3-15.
- Çobanoğlu, Ö. (1998). Sözlü Kompozisyon Teorisi ve Günümüz Halkbilim Çalışmalarındaki Yeri, folkloristik, Ankara.
- Çobanoğlu, Ö. (2012). Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş, Ankara: Akçağ
- Dorson, R. M.(ed.) (1972). Concepts of Folklore and Folklife Studies. *Folklore and Folklife* (ed.R.M.Dorson), The University of Chicago Press: Chicago & London, pp.1-51.
- Dorson, R. M. - THOMS, W. J. (1997). William John Thoms ve 'Folklore' Başlıklı Yazısı (çev. S. Cengiz). *Milli Folklor*, sayı: 36, 89-92.
- Dundes, A. (1998). Doku, Metin ve Kontekst (çev. M. Ekici). *Milli Folklor* sayı:38, 106-119.
- Ersoy, R. (2004). 'Performans Teori' Bağlamında Sözlü Kültür Ürünlerinin Müzelenmesi Sorunu Üzerine Bazı Görüş ve Düşünceler. *Somut Olmayan Kültürel Mirasın Müzelenmesi Sempozyum Bildirileri* (Yay.haz. M.Öcal Oğuz vd.), Ankara: Gazi Üniversitesi THBMER yay, 57-67.
- Hamelink, W. & Barış, H. (2014). Dengbêjs on borderlands: Borders and the State as Seen Through the Eyes of Kurdish Singer-poets, *Kurdish Studies, Volume: 2, No: 1, 34 – 60*. www.kurdishstudies.net
- Karadağ, M. (2004). Türk Halk Edebiyatı Anlatı Türleri (4.bsk), Ürün yayınları: Ankara.
- Keskin, N. (2015a). Tûr-Abdin'de Bir Kimlik ve Anlatım Biçimi: Mitirblar ve Mîtriplik. *Folklor/Edebiyat, cilt: 21, sayı:84, (2015/4)*, 57-72.
- Keskin, N. (2015b). Mitirb û Mitirbî: Nasname û Vegotin. *Wêje û Rexne, 6*, 109-120.

- Kızıl, H. & Tanrikulu, V. (2015). Berawirdkirina çîroka Hedlîlik Bedlîlik a bi Kurdî bi Gur û Heft Karikan a Birayêن Grimm re. *International Journal of Kurdish Studies 1 (2)*, 70 - 85 .
- Magoullick, M. (2015). Fieldwork/Ethnography and Performance Theory, <https://faculty.gcsu.edu/custom-website/mary-magoullick/performance.htm> Dîroka lênenînê: 09.11.2015.
- Ong, W. J. (2003). Sözlü ve Yazılı Kültür. (3.bsm.). İstanbul: Metis Yayıncıları.
- Özbudun, S. & Şafak, B. & Altuntek, S. N. (2007). Antropoloji: Kuramlar/Kuramcılar (2.bsk), Dipnot: Ankara
- Örnek, S. V. (2000). Türk Halkbilimi (2.bsk). Kültür Bakanlığı: Ankara
- Öztürkmen, A. (1998). Folklor ve Milliyetçilik. İstanbul: İletişim.
- Pertev, R. (2015). Edebiyata Kurdî ya Gelêri. Stenbol:Avesta.
- Uzun, M. (1998). Dengbêjlerim, İstanbul: Gendaş Kültür
- Mutlu, E. (1996). Kürt Müziği Üzerine. *Kürt Müziği* (Nezan, Izady, Tatsumura, Mutlu, Poche, Christensen, Komitas). İstanbul: Avesta, 53-64.
- Yıldırım, K. & Pertev, R. & Aslan, M. (2013) Ji Destpêkê Heta Niha Folklora Kurdî. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.

MALPER:

- <http://diyarnname.com/article.php?Idx=2169> -dîroka lênenînê 19.01.2016
- <http://zaroktv.com.tr/Kurmanci/Program/Heb-tune-b> -dîroka lênenînê ya dawî: 19.01.2015
- <http://www.sinemavesinema.com/adile-nasit-vefatinin-28-yilinda-sevenleri-tarafindan-anildi-c3237.html> - dîroka lênenînê: 20.12.2015
- https://tr.wikipedia.org/wiki/Adile_Nasit -dîroka lênenînê 20.12.2015
- <http://www.kulturelmirasmuzesi.com/index.php> -dîroka lênenînê: 15.11.2015
- http://turk_halkbilimi.gazi.edu.tr -dîroka lênenînê: 15.11.2015
- <http://www.ankarakultur.gov.tr/servisler/kultur-ve-tabiat-varliklari/muzeler/somut-olmayan-kulturel-miras-muzesi> -dîroka lênenînê: 15.11.2015
- <http://mardintiyatro.org/festival-2015/> -dîroka lênenînê: 20.12.2015
- <http://mardintiyatro.org/wp-content/uploads/2015/11/MardinKatalog-2015-dijital.pdf>-dîroka lênenînê: 20.12.2015

- <http://www.counter-currents.com/2011/05/herders-theory-of-the-volksgeist/print/> -dîroka lênerînê: 09.10.2015.
- <http://www.unesco.org/culture/ich/en/what-is-intangible-heritage-00003> -dîroka lênerînê ya dawî: 11.12.2015.
- <http://www.unesco.org/culture/ich/en/convention#art2> - dîroka lênerînê ya dawî: 11.12.2015.



Курды Казахстана и Средней Азии Kurds of Kazakhstan and Central Asia

In Turkey, for the first time, on December 10, 2009, the Institute of Living languages in Mardin Artuklu University was established and the education of Kurdish Language was commenced. After the establishment of this institute, in some of the cities of the region such as Muş, Van and Bingöl, institutes were established. The establishment of these education organizations was of great significance for Kurdish people, consequently, these establishments gave people of the region and Turkey great excitement. When the announcement for master education was proclaimed, hundreds of people, with immense exhilaration applied for the exams to be held. Some of them succeeded in the exams and started to have their education. The Education Minister and the chairman of the council of higher education announced that "...those finishing the program would have right to be the teacher of Kurdish Language". Hundreds of people have finished this program but unfortunately just 28 of them became teachers. Furthermore, in order to obtain academic to teach at universities, there is a great necessity for staff. It is also a huge problem waiting to be solved. In some of universities, the Kurdish language and literature departments were started under the umbrella of Faculty of Literature (Letters) and some are waiting to be established. There are many obstacles in this aspect to be solved, as well. Some departments for the Culture and Literature Kurdish were established, however, there are many problems in terms of place, library, study saloons and conference halls, education materials and etc., it needs to be noticed and be solved in the shortest time available. Our objective in this article is to focus on these problems and to offer some solutions. If the existing problems culture and language mentioned are solved, we strongly believe that god opportunities will emerge and it will give rise to the peace and brotherhood process for the peoples.

Keywords: institute, Literature, Department, Kurdish, Language, Living

Recommended citation:

Sonmez, N. (2016). Pirsgirêkên beşa ziman û edebiyata Kurdî di zanîngehên Tirkîyeyê de [The Problems of Kurdish Language and Literature Departments in Turkey]. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp.96 – 104.

* Ev gotar hanê cara yekem di 11-12 Hezîran 2015an de li Zanîngeha Bîngolê di sempozyuma "Toplumsal Barişin Sağlanması ve Sonrası" de hatiye pêşkeşkirin. Me ev gotar cara duduyan di ber çavan re derbaskir û berfirehtir kir paşê jî di vî kovarê de da weşandin.

¹ Asst. Prof. Dr., Vice Director of Institute of Living Languages and The Chairman of Kurdish language and Culture Dpt., Yuzuncu Yıl University, Van, Turkey.

Kurte

Li Tirkîyeyê cara yekemin, di 10'ê meha Berfanbarê ya sala 2009'an de li Mêrdînê, di Zanîngeha Artukluyê de bi navê Enstîtuya Zimanê Zindî enstîtuyek hat avakirin û li vê enstîtuyê xebatê perwerdehiya zimanê kurdî dest pêkir. Li dû vê enstîtuyê, li hinek bajarêñ herêmê wek Mûş, Wan û Bîngolê jî enstîtu hatin vekirin. Avakirina van saziyêñ perwerdehiyê, ji bo Gelê Kurd tiştekî gelek girîng bû lewra van avakirinan kelecanek zêde zêde da hemwelatiyêñ herêmê û yên Tirkîyê. Dema ku ji bo serlêdanêñ xwendekarêñ lîsansa bilind îlan hatin dayîn bi sedan kes, bi kelecanek gewre, serî li azmûnan dan. Hinek ji wan di van azmûnan de bi ser ketin û dest bi perwerde ya xwe kirin. Wezîrê perwerdehiyê û Serokê Lijneya Hindekariya Bilind di serî de ji bo vê bernameyê digot ku: "Ên vê bernameyê xilas bikin dikarin bibin mamosseyê zimanê kurdî". Bi sedan kesî ev bername xilas kirin lê mixabin ji wan tenê 28 kes bûne mamosse. Dîsa ji bo peydakirina mamosseyêñ ku di zanîngehan de dersan bidin, hewcedariyek mezin bi qadroyan hene. Ev jî pirsgirêkek gelek mezin e û li benda çareseriye ye. Di hin zanîngehan de di bin banê Fakulteya Edebiyatê de, besen Ziman û Edebiyata Kurdî hatine vekirin û hinek jî hêj li benda vekirinê ne. Di vî warî de jî gelek astengî hene û hewce ye werin çareserkirin. Ji bo çand û edebiyata kurdî beş hatine vekirin lê mixabin em dikarin bibêjin di warê cih, pirtûkxane, salonêñ xebat û konferansan, materyalêñ perwerdehiyê û hwd. de gelek kemasî û pêdivî hene, hewce ye ev bêñ dîtin û bi lez bêne çareserkirin. Em di vê gotara xwe de dixwazin li ser van pirsgirêkan bisekinin û ji bo çareseriya wan hinek pêşniyazan bînin zimên. Heke ev pirsgirêkên ku di warê çand û zimên de hene, werin çareserkirin, em di vê baweriyê de ne ku; ji bo pêvajoya aşti û biratiyê wê ïmkanêñ zor baş derkevin holê û bibin sedema biratî û aştiyê ji bo gelan.

Peyvîn Sereke: Enstîtu, Edebiyat, Beş, Kurdî, Ziman, Zindî

1. DESTPÊK

Pirsgirêka Kurdî, em dikarin bibêjin di sedsala XIX. hetta berya vê sedsalê destpêkiriye. Dema ku Komara Tirkîyê di sala 1923'an de hat damezrandin bi awayekî zelal pirsgirêk derketin holê. Ji ber ku komar, li ser hîmê înakar û pişaftinê hat avakirin û ji xeynî Tirkan tu gelên din nasnekirin û gotin ji xeynî Tirkan li ser vê axa pîroz hindikayiyêñ nemisilman hene û ji Kurd, Ereb, Çerkez û hwd. netewan re gotin hûn hemû Tirk in. Bi salan ev fîkr û ramana nerast pejirandin û ji Kurdan re gotin: "Hûn Tirkêñ çiyayî ne, dema hûn li ser berfê geryane lingêñ we dengê kart-kurt derxistî ye ji bo vê sedemê ji we re gotine Kurd". Li ser deşt û çiyayêñ Kurdan "Ne mutlu Türk'üm diyene / Ê bêje ez Tirk im kêf kêfa wîê ye." dinivîsandin û her roj zarokêñ kurdan hînî derewan dikirin û bi zarokan ev gotina "**Türküm, doğruyum, çalışkanım...— Tirk im, durust im, xebatkar im...**" nerast didan gotin. Zarokêñ kurdan jî digotin: "Em Tirk nînin gelo çîma van gotinan bi me didin gotin?".

Kurdan jî, li dijî van fîkrêñ nebaş reaksiyon çêdikirin û nerazîbûna xwe nişan didan. Ev yeka hanê jî dibû sedema şikence û muamela nebaş û bi sedan kurd diketin hepsan û zîndanan. Ev fikra pişaftin û nijadperestiyê, di vî welatê gelek xweş û şîrîn de ewletî nehîş û bu sedemê qetîşaman û bi hezaran kes hatin kuştin, birîndarkirin, zarok bê dê û bav man, bi hezaran gund hatin şewitandin, bi mîlyonan pere hatin xerckirin û di warê aboriyê de gelek qelsî derketin holê. Lê rêvebirêñ Komarê dîsan jî nikarîbûn vê pirsgirêkê çareser bikin û çareser nekirin jî. Her carê bi eynî rê û rîbazan dixwestin van pirsgirêkên dîrokî çareser bikin, lê dawî li pirsgirêkan nedihat û her diçû ev pirsgirêk zêdetir dibûn. Jê re çareyek nû lazim bû, gelo çareyek çawa? Rêvebirêñ komarê gelek caran ev pirsa hanê ji xwe dikirin û em di vê baweriyê de ne ku wan bersiva wê dizanîbû lê nedigotin.

Gelek caran rewşenbîrên Kurdan û Tirkan rê nîşanî rêvebirê komarê didan, lê mixabin ew her carê bi xayîntiyê dihatin tewanbarkirin û cihêن wan dibû heps û zindan. Hinekan nedixwestin ev pirsgirêkên ku zirarê didin him kurdan him jî tirkan werin çareserkirin. Hinek kes dibêjin, gelek destêن tarî yên bi qilêr û gemar naxwazin ev pirsgirêk werin çareserkirin, ji bo ku ew jî vê kaniya bi gemar û qirêj avê vedixwin, çekan difroşin û pê dewlemend dibin. Lê dîsa jî rewşenbîran dev ji çareseriyê ber nedan û rêya çareseriyê li her der û zemanî bi qêrin û zarîn gotin.

Gelek siyasetmedar jî di wê baweriyê de bûn ku, ev pirsgirêka kurdan bi çekan nayê çareserkirin. Mixabin gelek ji wan bêcesaret bûn û nedixwestin serê xwe ji bo vê pirsgirêkê têxin belayan û dixwestin di derbarê vê mijarê de eqlê selim ji wan dûr bikeve û serê xwe neêşinîn. Ji wana hinekan cesareta xwe top dikirin û digotin em ê vê pirsgirêkê çareser bikin, lê mixabin wan jî mîna marşa mehterê ya Împaratoriya Osmaniyan du gav bi pêşve diavêtin gavek jî şûnde. Bo nimûne, serokwezîrê berê Silêman Demîrel dema ku hukumeta xwe ava kir çû Diyarbekrê û got: “*Ez wek serokwezîr realîteya we kurdan nas dikim.*” lê li paş vê gotina xwe nesekinî û ji xeynî vê gotinê tu karek din nekir, serokwezîrê kevn Mesut Yilmaz jî hat Amedê û wiha axivî: “*Rêya Ewrûpayê di Amedê re derbas dibe.*” Tansu Çiller jî got: “*Em dikarin ji bo çareseriya pirgirêka kurd Modela Baskê ji xwe re bingeh bigrin û li ser qisebikin.*” Mixabin di dawiya axaftina wan de pirsgirêk çareser nebû û zêdetir li hev ket û carek din şer, pevçûn, qetliam çêbûn, zarok man sêwî, gund hatin şewitandin û qetlêñ faîlêñ meçhulî zêdetir bûn.

Serokê kevn Erbaqan got: “*Eger hûn bibêjin ‘ci şanaziyeke bo kesê ku dibêje ez Türk im’ ew ê kurd jî bibêjin ku ‘ci şanaziyeke bo kesê ku dibêje ez Kurd im’*” Ev gotina Erbaqan bû sedemek ji sedemêñ girtina Partiya Refahê.

Serokkomarê berê, Rêzdar Turgut Ozal jî xwest vê pirsgirêkê çareser bike lê mixabin li ser wî jî gelek dek û dolab hatin çekirin û di dawiyê de ew jî bi qilo pilo koçî dawî bû û çû.

2. REWŞA ZIMANÊ KURDÎ

Komara Tirkîyê ji sala 1992'an vir de di warê pirsgirêka kurdî de rastî pirsgirêkek nû hat. Ev pirsgirêk jî ev e ku; kurd dixwazin di xizmetên gelempêri de zimanê xwe bi kar bînin. Yanî kurd dixwazin di meclîsê de, di perwerdehiyê de, di çapemeniyê de, di rêvebiriyêñ herêmî de, di dadgehan de, di mizgeftan de, di warê hunerê de û hwd. zimanê dayîka xwe bi kar bînin. Ev daxwaza hanê jî dide xuyakirin ku, pirsgirêk ketiye merhaleyek nû.

Komara Tirkîyê, bi taybetî ji sala 2002'an û vir de hukûmetên Partiya AKPê dest bi pêvajoyek nû kir û xwest ku zimanê kurdî di çapemeniyê de, di perwerdehiyê de, di hunerê de û di siyaset û propogandayê de were bi kar anîn lê sînorê vî mafê hanê jî diyar kir û got bira bi tenê di warê çandê de were bikar anîn. Ji bo vê sedemê rêvebirêñ komarê bi çavêñ mafê takekesî û çandî di çarçoveya folklorî de li zimanê kurdî mêze kirin.

Çawa ku me li jorê jî got, daxwaza kurdan ne bi tenê bi kar anîna ziman di çarçoveya takekesî de ye. Ew dixwazin zimanê xwe, di hemû aliyêñ jiyanê de bixebeitînin. Rêvebirêñ komarê pirsgirêka zimanê kurdî weke tiştek teknîkî didîtin û digotin eger em di warê teknîkî de hinek astengan ji holê rakin, ev pirsgirêk dê were çareserkirin. Lê kurd jî wisa nafikirin, dibêjin hewcaye mirov li vê pirsgirêkê bi çavêñ mafê mirovan mêze bike û bi wî azînê

tevbigere û dibêjin hewcye zimanê kurdî ji sinorê çandê derbas bibe û di warê siyasi de cihê xwe bi awayek xurt bigre.

Dewlet, bi çavê teknikî li vê pirsgirêkê mîze dike û kurd jî bi çavê mafê mirovatiyê lê mîze dîkin. Bi çi çavî lê tê mîzekirin, bila were mîzekirin, em îro dibînin ku zimanê kurdî hêdî hêdî di warê xizmeta gelempêrî de cihê xwe digre.

Di dîroka Komara Tirkîyê de Zimanê Kurdî cara yekem di sala 1991'î de, li parlamentoya Enquerê ji devê parlementera partiya DEP'ê ya Diyarbekirê Rêzdar Leyla Zana ve dema sond xwarina bo parlementeriyê de, bi wê hevoka ku di dawiya sondxwarina xwe de bi kurdî gotibû: “*Ez vê sondê ji bo Gele Kurd û Tirk dixwûm.*” û piştre ket rojeva siyasetê. Dema Zana, ew hevok bilêv kir kevir û kuçik lê hatin barîn û ew û hevalên wê bi salan di heps û zîndanan de man û di sala 1994'an de namzetiya wan ji destêwan girtin û partiya wan jî dadan. Pişî ku 19 sal di ser vê bûyera nebaş re derbas bû, di warê zimên de du bûyer qewimîn: Ya yekemîn ew bû ku; di meha Adara 2010'an de, parlementerê partiya BDP'ê di derbarê mafê nivîsandina zimanê kurdî de pêşniyazek da parlementoyê. Dema ev pêşniyaz di parlementoyê de hat xwendin qedexekirina li ser Zimanê Kurdî hate qulkirin û navê Şivan Perwerî bi tîpa “w” yê hate nivîsandin. Hetanî wê demê bikaranîna tîpê “q, w, x” qedexe bûn û bikaranîna wan dibûn sedemê ceza dayînê. Hetanî wê gavê eger hevokek kurdî di meclîsê debihata gotin di zabitnameyan de weke “*zimaneku nayê zanîn*” dihat qeydkirin. Ez nizanim gelo bi zanîn an bi nezanî, bi awayek rasteqînî, yanî di kurdî de çawa derbas dibe wisa jî di zabitnameyan de hate qeydkirin. Ev rewseke girîng û merhaleyek nû bû.

3. DÎ QADA PERWERDEHÎYÊ DE REWSA ZÎMANÊ KURDÎ

Ji bo ku mijar baş derkeve holê û bi awayek zelal were fêmkirin em dixwazin vê mijarê di bin sê bordan de binirxînin:

3.1. Ji Bo Perwerdehiya Zimanê Kurdî Qursê Taybet

Cara yekem li Tirkîyê bi awayekî qanûnî destûra qurswêñ taybet ji bo Zimanê Kurdî hate dayîn. Di 20'ê Tebaxa 2002'an de, di rîziknameya bi navê “*Perwerdehiya ziman û zaravayê cûda yê ku hemwelatiyê Tirkîyeyê di jiyana xwe ya rojane de bi awayekî kevneşopî de dixebeitînîn.*” de guhertin hate çêkirin û vekirina qursê taybet, ji bo Zimanê Kurdî hêsan bû. Em di wî baweriyê dene ku ev guhertina hanê di derbarê krîterên Yekîtiya Ewrûpayê de hate çêkirin. Lê di gel van guhertinan dîsan jî rêvebirê karêñ perwerdehiyê astengêñ cuda cuda derxistin. Ew hincetêñ rêvebirêñ perwerdehiyê jî hatin çareserkirin û di meha Nîsana 2004'an de li bajarê Wan'ê, qursa Zimanê Kurdî dest bi perwerdehiyê kir. Kapasîteya vê qursê bi qasî girtina 480 xwendekarî hebû. Mixabin 82 kesî serî li qurşê dan, li Batmanê jî di meha Nîsana 2004'an de bi besdarbûna nêzîkî 30 hezar kesî qursa Zimanê Kurdî hat vekirin. Paşê jî li pê hev li bajarêñ cur be cur qurs hatin vekirin, mixabin ji ber hin bêderfetîyan qursê vekirî jî yek bi yek hatin girtin.

Ev bûyer danî xwuyakirin ku; eger dewlet bi awayekî fermî, alîkariya van qursan neke tu serkeftin çenabe. Ji ber ku gelê herêmê, di warê aboriyê de di rewşek nebaş de ye û ew nikarin bihayê qursê jî bidin. Ya duyem jî; dema ku wan ev qurs xelas kirin û belgeyêñ xwe wergirtin, ev belge bo kar û xebatekê wê bi kêrî wan neyê. Hewcye ku di jiyana rojane de ji bo van belgeyan wateyek hebe û bi kêrî tiştekî were.

Ji aliye din ve jî gel difikirî û digot: ‘gelo em ê çîma zimanê dayika xwe bi peran û di qursêñ taybet de fêr bibin?’ . Ev rewşa hanê ji xwe re weke heqaret didîtin û li dijî vê bertek nîşan didan. Kurdan dev ji van qursêñ taybet berdan û fikra perwerdehiya bi zimanê dayikê anîn ziman û gelek çalakî li dar xistin. Kurdan gotin ku; gerek zarokêne me di dibistanan de bi zimanê xwe perwerde bibin!

Kurdan digot; eger dewlet alîkariya vî karê hanê neke zimanê kurdî di bin xeterek mezin de ye û rewş wiha berdewam bike wê Zimanê Kurdi mîna hinek zimanan bibe zimanake mirî. Zimanê Kurdi, bi qursêñ taybet nikare li ber xwe bide, li ser lingan bisekine û zindîbûna xwe bidomîne. Eger ziman di jiyana gelêrî de tune be, bi teqeze temenê wî kêm e.

3.2. Mafê Perwerdehiya Zimanê Zikmakî

Kurd, di Komara Tirkîyê de xwe ne wekî hindikayî weke unsurên eslî dibînin, ji bo vê sedemê di warê zimêñ de jî, bi vî awayî difikirin û dibêjin ku: “Mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî mafê me ye jî”. Em vê daxwaza hanê ya di rî de di serê salêñ 2000’an de zêdetir dibînin. Di wan salan de, xortêñ kurdan ên ku di zanîngehan de dixwendin serî li serokatiyêñ besêñ ku têde dixwendin didan û digotin; em dixwazin bi zimanê dayîka xwe perwerdehiyê bibînin. Sed car heyf ew xortêñ ku serî li serokatiyêñ besêñ xwe didan, yan têkiliyêñ wan ji zanîngehêñ wan dihate qutkirin yan jî, bi salan ceza diwxarin û bersiva daxwaza wan dibûn heps û zindan. Lê gelê Kurd dest ji daxwaza xwe bernedan û di destpêka perwerdehiya sala 2010-2011’an de li gelek deverêñ ku kurd lê hebûn, di hefteya yekemînde çalekiyek li dar xistin û navê wê jî danîn; “serkêşıya sivîlî” yan jî “boykotkirina dibistanan” û zarokêne xwe neşandin dibistanan.

Hinek kes li dijî vê xwestekê derdiketin û bihaneyêñ wan jî bi gelempêri ev bûn: Ne mumkun e ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdehiyê, ji ber ku zimanê kurdî ji bo zanistiyê ne dewlemend e, gel perçê perçê dike, dibe sedem ku kurd û tirk ji hev û din fêm nekin, yekîtiya komarê xerab dike, ne mumkune ku ji bo perwerdehiya zimanê kurdî binesazî were amadekirin û ji bo vî karî jî mesrefek giran lazim e, zarokêne ku bi kurdî perwerdehiyê dibînin di jiyana gelempêri de nikarin kar bikin, eger ev daxwaz were cih dibe sedemê zimanê fermî yê duyemîn di jiyana gelempêri de û hwd. em dikarin van bihaneyan zêde zêde dirêj bikin lê ne hewcye.

Li vir du rayêñ sereke derdikevin holê, ji wana yek perwerdehiya bi zimanê zikmakî; ya duduyan jî, perwerdehiya bi yek zimanî yanê bi zimanê Tirkî. Kurd dibêjin, eger Zimanê Kurdi nebe zimanê perwerdehiyê; di pêşerojê de ewê di bin bandora zimanê Tirkî de bimîne û di nav çend salan de wenda bibe. Zimanê Kurdi ruhê kurdøyetiyyê ye, rûmeta kurdan e, eger ziman biçe wenda bibe wê kurd jî wenda bibin. Eger kurd dixwazin neyên pişaftin û weke miletek ji mileten dinyayê jiyana xwe berdewam bikin, hewcye li zimanê xwe xwedî derkevin û perwerdehiyê bi zimanê dayîka xwe bibinin.

Raya duduyan jî dibêjin, eger em mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî bidin kurdan; ev biryar dibe sedemê perçebûna welatê me, kurd û tirk ji hev cuda dibil û nikarin têkiliyan bi hev re deynin û ji hev û din fêm bikin.

Em di vê baweriyê de ne ku, ramana yekemîn rast e û ya duyemîn jî çewt e. Eger mafê zimanê zikmakî were dayîn ev biryara hanê wê bibe sedemê desthevgirtina kurdan û tîrkan.

Ev daxwaza hanê daxwazek însanî ye û di rêde ye. Bi sedsalan e kurd bi vî zimanî qisedikin û jiyana xwe didomînin. Ew ê çima bibe sedemê perçebûna welat! Zarokên kurdan hetanî heft saliya xwe bi kurdî diaxivin û dema diçine dibistana seretayî mîze dîkin ku mamosteyê/a wan bi zimanekî cuda qise dike û ew ji tu gotinêñ wî/wê fêm nakin. Ev jî dibe sedemê tengasiyek gelek mezin ji bo zarakan û psîkolojiya wan zêde zêde xerab dike.

Fikra duyemîn çewt e, ji bo ku ew kesêñ vî fîkr û ramanî derdixînin pêş, fikarek wiha tê hişê wan: Eger ev maf were dayîn wê welatê me perçe perçe bibe! Em dikarin bibêjin ev fikara hanê fikarek ne di rê de ye. Ev nabe sedemê perçebûyînê, berevajî eger ev maf neyê dayîn ew ê bibe sedemê perçebûyînê. Ji bo ku dema ev mafê însanî û mirovahî were dayîn wê kurd bifikirin û bibêjin ev komara hanê ya me ye jî çi maf daye gelê tirk daye me jî, hewcye ku em jî bi çavek baş li komarê mîze bikin û lê xwedî derkevin.

3.1.3. Di Zimanê Kurdi De Çapemenî

Kurdan bi zimanê xwe, berya avakirina Komara Tirkîyê gelek berhem nivîsandine. Piştî avakirina komarê zordariyek mezin li ser çapemeniya kurdî çêbûye û em dikarin bibêjin hetanî 1948'an tu berhemek bi kurdî û bi tîpêñ lafînî nehatîye nivîsandin. Di sala 1959'an de dema Musa Anter ji sedema doza 49. di girtîgehê de bû, metnek şanoyê bi navê "Birîna Reş" nivîsî û di sala 1965'an de ev berhem da weşandin û pişt re jî, bi dizî hinek berhem hatin çapkiran. Dema Kenan Ewren di 12'ê Îlona 1980'yî de înqilab çêkir, wekî hemû aliyan li ser çapemeniya Kurdî jî zor û zext zêdetir bûn lê li derveyî welêt kurdêñ rewşenbîr gelek pirtûk çapkiran û belav kirin. Di piş van tiştan re televîzyonêñ kurdî dest bi weşanan kirin, di sala 1995'an de Med TV dest bi weşanê kir û paşê jî nêzîkî 15 TV'an dest bi weşanêñ xwe kirin.

Di 2'yê Berfanbara 2009'an de di bin TRT'ê de qanalek kurdî bi navê TRT 6'ê bi zaravayê Kurmancî û Zazakî dest bi weşanê kir. Li hember vê biryarê hinek kesan bertekêñ erêni, hinekan jî bertekêñ neyînî nîşan dan. Yêñ ku bertekêñ erêni nîşan didan digotin ku, ev gava hanê gavek demokratîk e; yêñ bertekêñ neyînî nîşan didan jî digotin, ev fikra hanê rengek ji rengê cerdevaniya çandî û siyasi ye.

Dema TRT 6'ê dest bi weşana xwe kir pirsgirêkek kevnar e jî bi wê re derket holê; rêvebirêñ dewletê di derbarê elfabeya kurdî de digotin ku tîpa "q, x, w" di elfabeya tirkî de tune ye ji bo vê sedemê hewcye ev tîp neyîn bikar anîn, eger were bikar anîn wê bibe sedemê perçebûna welêt! Bi TRT 6'ê re azadî ji van tîpan re hat û bi awayek zelal ev tîpan hatin bikaranîn. Bo nimûne navê Van'ê weke Wan, navê cejna nevrûzê weke Newroz, navê Karsê weke Qers û navê Hude weke Xwedê hate bikar anîn.

4. Di Zanîgehan de Perwerdehiya Bi Zimanê Kurdi

Weke me li jorê jî gotibû; Kurd dixwazin ku di hemû aliyêñ xizmeta gelempêri de Zimanê Kurdi were bikar anîn. Keç û xortêñ kurdan ji bo bi zimanê dayika xwe perwerdê bibînin daxwazname dan serokêñ beşen xwe, lê mixabin bersiva daxwaza wan yan heps û zîndan, yan jî qutkirina têkiliyêñ wan ji zankoyêñ wan bûn.

Di Mijdara 2008'an de Serokê Lijneya Hindekariya Bilind (YÖK) Rêzdar Yûsuf Ziya Özcan got : "Eger ji bo avakirina beşa Ziman û Wêjeya Kurdi daxwaz werin kirin em ê van

daxwazan binirxînin". Rêvebirêن YÖK'ê digotin ku di warê qanûnê de li pêşîya vê xwestekê tu asteng tune ne û daxwazkirina zanîngehan ji bo vekirina van beşan ji bo me bes e. Li ser van gotinan Rektorê Zanîngeha Mardin Artûklûyê Rêzdar Prof. Dr. Serdar Bedî Omay, daxwuyaniyek da çapemeniyê û got di derbareyê vê mijarê de me hinek tişt amade kirine û ji bo vekirina beşê emê di demeke kin de serî li YÖK'ê bidin. Hinek zanîngehê din jî weke Rektorê Zanîngeha Enquerê, Şîrnexê û Hekariyê jî bi nêrînek baş li vê daxwazê mêzekirin. Sed car heyf û mixabin piştî salekî YÖK'ê bersiv da û got; em naxwazin bi navê Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî beşekê vekin lê em dixwazin bi navê "Yaşayan Diller Enstitüsü- Enstitûyên Zimanê Zindi" beşekê vekin. Li gorî vê biryarê di bin navê vê enstîtûyê de li ser Zimanê Kurdî, Farisî, Erebî û Sûryanî xebat tê kirin. Rektorê Zanîngeha Mardin Artûklûyê li dijî vê biryarê bertek nîşan da û got; eger ji bo beşa zimanê Kurdî di bin fakulteyan de beşa lîsansê neyê vekirin ev kêmasiyek gelek mezin e û gotinên xwe wiha domand : "Kurdolojî zanistiyek e kevnare ye û diroka wê digêhêje 1787'an û hetanî vê gavê di 30 zanîngeh, enstitû, beş, navend, kursî û hwd. de tê ferkirin. Lê mixabin di welatê me de bi navê xwe nayê avakirin, ev jî nakokiyek mezin e û şirovekirina vê jî gelek zor e. Eger ku ev beş ne bi navê Kurdolojîye bi navê 'Enstitûyên Zimanê Zindi' were binavkirin, ev dibe ku bibe sedema dilşikestiniya hemwelatiyên me yên Kurd."

Dîsa di Îlona 2009'an de Rektorê Zanîngeha Stenbolê Rêzdar Prof. Dr. Yusuf Söylet jî di derbarê "pêvajoya vebûnê de" got; me biryar da ku em di zanîngeha xwe de beşa Kurdolojîye vekin. Lê serokê YÖK'ê Birêz Özcan got ku pêşikiya me bi zimanê Kurdî nîne bi zimanên din hene. Li gorî wî hewcye berî vekirina vê beşê beşa Zimanê Tirkî, Farisî û Erebî were vekirin û were xurtkirin. Ji xwe li gorî Birêz Özcan Zimanê Kurdî ji % 60-70 Farisî ye û ji % 20-25 Erebî ye û hinek pevv jî ji Zimanê Tirkî hatine girtin. Bi rastî Birêz Özcan, bi zimanek akademik digot Zimanê Kurdî ne zimanek bi serê xwe ye, ji bo vê sedemê bi awayek sergirtî digot nehewcye Kurdolojî were vekirin.

Di 10'ê Berfanbara 2009'an de li Mêrdînê di Zanîngeha Artukluyê de cara yekemin bi awayekî fermî navê wê Kurdolojî nebe jî, bi navê "Enstituya Zimanê Zindi" enstîtuyek hate avakirin û di vê enstîtuyê de Beşa Ziman û Çanda Kurdî, Beşa Ziman û Çanda Suryanî û Beşa Ziman û Çanda Erebî hate sazkirin. Paşê jî weke, li Dêrsim, Bingol, Muş, Sêert û Wan'ê ev enstîtu hatin vekirin. Em dikarin bibêjin zimanê Kurdî di xizmeta gelempêrî de bi awayek berfireh cih girt.

4. ENCAM

Me di vê gotara xwe de xwest ku em berê, li Tirkîyê hinekî behsa rewşa Zimanê Kurdî bikin û paşê jî ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî û pêvajoya aşitiyê hinek pêşnîyazan bînin ziman. Weke tê zanîn pirsgirêka kurdî pirsgirêkek kevnare ye û hewcye bi lez û bez were çareserkirin. Di çareserkirina vê pirsgirêkê de girîngiya herî mezîn ziman e. Eger ev pirsgirêk were çareserkirin gelek aliyêن pirsgirêkê çareser dibin û pêvajoya aşitiyê bi awayekî serkeftî bi dawî dibe. Li gorî hîzr, fîkr û ramanê me, ev tiştêن ku em li jêr dibêjin eger werin çareserkirin ew ê bi awayek baş barê pêvajoyê sivik bibe. Divê ev karêن li jêr tene gotin ger werne bi cih anîn wê ew baweriya gel carek din xwurt bibe.

1. Ew astengiyênu ku li pêsiya perwerdehiya zimanê kurdî hene bi awayek baş bêna paqî kirin û him di mîjûyê rîvebirê komarê de zelaliyek bê çêkirin him jî dilê kurdan yê şikestî were xweşkirin. Nehewceye ku rîvebirê komarê zimanê kurdî ji xwe re weke hevrik bibîne û cudahiyê têxine navbera zimanê kurdî û tirkî. Divê zimanê kurdî piçûk neye dîtin û weke tê gotin “ev ne zimanek serbixwe ye û tevlihevkirina hinek zimanen e, ne zimanê şarezayî û zanistiyê ye, zimanê çiyayiyan” e lê heqaret neyêne kirin û hewceye fîrsendê bide zîmanê kurdî ku ew di jiyana gelempêrî de bi hemû alîyan ve cihê xwe bigre. Weke tê zanîn zimanê kurdî van gotinan heq nake û ew jî weke zimanen dînyayê zimanê gelekî ye û bi vî zimanî di warê edebiyat, felsefe û hunerê de gelek berhem hatine nivîsandin û bi mîlyonan kes bi vî zimanî diaxivin.
2. Ew kesênu ku di van sazgehan de dixebeitin, hewceye rîvebirê komarê bi her aliyî de bi wan bawer bin û di derbarê niyeta wan de tiştên weke; gelo armanca van kesan çî ye, gelo dubendiyê dixwazin têxin nava gel, dixwazin welêt perçê bikin û hwd. nefikirin û wan kesan rencîde nekin. Ji bo ku ew kesênu ku di van sazgehan de dixebeitin ew jî weke akademîsyen û karmendêna sazgehê din karêna xwe dikin. Yanê gerek xebatkar dema karêna xwe dikin bila fikar nekin û nebêjin gelo rîvebirê zanîngeha me di derbarê me de çi dibêjin û çi difikirin. Bi kurtasî hewceye ewletî û bawerî di navbera herdu aliyan de jî hebe.
3. Hewceye navê Enstîtuya Zimanê Zindî were guhertin û yan bibe Enstîtuya Kurdolojiyê yan jî bibe Enstîtuya Ziman û Edebiyata Kurdî. Çawa ku dema di TRT yê de qanalek hat vekirin nav lê hat danîn TRT 6 û paşê jî hate guhertin û navê wî bû TRT Kurdî, ev guhertina hanê zêde zêde di rê de bû wisa jî navê enstîtuyan bêna guhertin. Ji bo ku dile kurdan hinek nerm û germ bibe.
4. Ji bo van sazgehan gerek avahiyêna serbixwe bêna çêkirin. Hewceye ev enstîtu jî mîna enstîtuyêna din di bin banê xwe de bin. Eger ev wiha be enstîtu wê xwe bi qedr û qîmet bibînin û bi moralek xweş û ges karêna xwe bidomînin. Ger odayê mamosteyan berfireh û cuda nebin, karmendêna sazgehê hemû li ser hev, di odayek du odayen de bicivin û kar bikin ev tiştîk gelek nexweş û xirab e. Weke besen din polen dersdayînê bila aîdî besê bin û hewcedarî bi çend polan hebe, ewqas pol bêna vekirin.
5. Pirsgirêka qadroyan hewceye bi awayek lez û bez were çareserkirin. Eger di sazgehek de bi qasî hewcedariyê mamoste tunebin, baweriya xwendekaran bi wê besê nayê û ew bes bi awayek rêk û pêk nikare bi ser bikeve. Ji bo ku van besan cara yekem li Tirkîyê de dest bi xizmetê kirine hewceye bi çavek pozitif li wan were mîzekirin û wekî besen din zêdetîr qadro were dayîn jî bo ku bikaribin li ser lingêna xwe bisekinin.
6. Ji bo Kurdolojiyê pêwiste ku bi awayek zû di hemû zanîngehêna ku tê de ev bes heye pirtûkxane werin avakirin. Ji bo avakirina pirtûkxaneyen hewceye zanîngeh di aliyê aboriyê de alîkariya rîvebirê enstîtuyan û mamosteyêna wan bikin û butcerek taybet jî were vegetandin, hewceye enstîtu jî di vî aliyî de alîkariya hevûdin bikin û çavkaniyêna li cem xwe bi hevûdin re parve bikin. Hewceye qomîsyon bêna avakirin û ji bo çavkaniyêna ku li derveyî welêt in û li welatêna weke Rûsyâ, Ermenîstan û Başûrê Kurdistanê ne bêna anîn.

7. Di navbera enstîtuyan de têkilî werin xurtkirin, çûn û hatin were çêkirin, ji bo ku kî ci dike ji aliyê yên din ve were zanîn.
8. Hewceye ders bi kurdî werin dayîn, xwendekar jî di dawiya perwerdehiyê de bi awayekî zorbaş hînî Zimanê Kurdî bibin.
9. Ji bo ku xwendekarên jîrek werne van beşan hewceye bi awayek garantî, soz were dayîn ku dema wan, ev beş qedandin bêkar nemînin. Di serî de gotin ên ku van beşan diqedîne em wan dikin mamosteyêne Zimanê Kurdî lê mixabin rêvebir li soza xwe xwedî derneketin. Nêzîka du-sê hezar xwendekar van beşana qedandine lê hetanî vê gavê 20-30 kes weke mamoste hatine tayînkirin. Eva jî dibe sedemê bêbawerîtiyê.
10. Hewceye di dibistanan de bi awayekî bêtirs hemwelatiyêne kurd bikaribin di nava dersênil hilbijarte de dersa Zimanê Kurdî hilbijêrin. Dema ev ders hilbijartin, bira fikar nekin û nebêjin rêvebirêne dibistanê gelo ji zarokêne me re tiştek nebaş dibêjin yan na. Lazime ku hemwelatî û xwendekar bi awayek kêfxweşî bikaribin van dersan hilbijêrin û bixwînin.
11. Di zanîngehan de dema xwendekaran xwestin ji dersênil hilbijarte dersa Zimanê Kurdî hilbijêrin, hewceye hem rêvebirêne wan fakulteyan him jî rêvebirêne enstîtuyan li peşîya wan astengan dernexînin û ji wan re bibin alîkar û karêne wan hêsanter bikin.
12. Hewceye siyasetmedar li ser vê pirsgirêkê bisekinin û ji bo zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyê xebatan bikin û ji îro de ji bo vî karî xwe û gel û sazgehan amade bikin.
13. Ya herî girîng ev e ku hewceye ev kar bi lez û bez werin kirin. Ji bo ku baweriya gel ji hêla pêvajoya aştiyê ve roj bi roj diçe kêm dibe û aramiya wan dibe ku xelas bibe û baweriya wan qet nemîne.

Hewceye evan kêmasiyan li demê neyê belavkirin û hindik hindik neyêne dayîn û di carekî de were dayîn. Ji bo ku bibe sedem qîmet û bibe xwedan rûmet.

Keda Çewres Serran û Yew Kedkaro Bêhempa: M. Malmîsanij û Kitabê ci “Kurmancca İle Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi”**Ahmet Kirkan¹****Received:** January 4, 2015 **Accepted:** January 26, 2015**Nuştox:** M. Malmîsanij**Weşanxane:** Weşanxaneyê Vateyî, 2015**Mijar:** Gramer, Gramero Muqaseyî**Rîpel:** 302**ISBN:** 978-975-6278-89-5

Kitabê Mamosta M. Malmîsanijî keda 40 serre emre ci ya. Çunke yeno zanayene ke kitab nuştene û xususen zî kitabê grameri nuştene zaf çiyêko zehmet o. Ganî ke gramerzan yan nuştoxê gramerî; ziwan û lehçeya xo de xorîn bo, eserê ke o ziwan de ameyê nuştene ïnan ra xeberdar bo, tarîxê ziwanê xo bizano, lehçeyanê ziwanê xo bizano, lehçeya xo ser o pispor bo, çend hebî ziwanê xerîbî ke ziwanê ci ya têkildar ê bizano. Yanî gramer nuştene bi gramerî ya pîya heme çî ya eleqedar o. Eke no gramer, gramerê kirmancî (zazakî) bo, gureyê ziwanzanî hîna aloz û zehmet beno. Çunke kirmancî wayîrê edebîyatêkî nuştekî nîya, eserê nuştekî hîna newe-newe yenê nuştene, feki û şîweyî zaf ê, her fek xo sey feko bingeyên hesibneno, hetê standardîzasyonî ra şeklêk ke her kesî sey konsensusî qebul kerdo çin o, pîyase de zaf kitabê gramerî estê ûsn. zorîyî karê cigêrayoxî zor kenê. Ganî kes ifade biko ke gramer nuştene seba ziwanî karo tewr bi zehmet û tewr aloz o. Kurdkî de no proses bi şeklêko xerîb cereyan keno. Nuştoxî verê verkan kitabê gramerî nusenê û dima sewbîna eseran nusenê.

Recommended citation:

Kirkan, A. (2016). Keda Çewres Serran û Yew Kedkaro Bêhempa: M. Malmîsanij û Kitabê Ci “Kurmancca İle Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi”[Review of the book Kurmancca İle Karşılaştırmalı Kırmancca (Zazaca) Dilbilgisi by M. Malmîsanij]. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp. 105 – 108.

¹ Research Assistant, Dicle University, PhD Student, Kurdish Language and Culture, Diyarbakır, Turkey, E-mail: ahmetkirkan@gmail.com

Labelê gramer nuştene karêko zor o. Heta nika Sazgeha Ziwan yê Tirkî tena yew kitabê gramerî neşr kerdo. Çunke eke dîyin, hîreyin... zî bibo o wext gure têmîyan keweno. Malmisanijî 40 serre xebata gramerî kerda û dima kitabêk nuşto. Qandê cû ma no kitab weçîna û ney ser o vindertî.

Piyase de çend hebî kitabê gramerî estê ke nînan ra taye ci bi şeklêko lokal/mehelî ya ameyê nuştene. Nê kitabî xebata folklorî de û xebatanê mehelîyan de cayêkê muhîmî gênê. Labelê kitabê M. Malmisanijî hetê tedeyî, ûsul, tertîb, izahat, vatene û kede ra cayêko taybet de yo. Kitab de, Malmisanijî gramer goreyê qaydeyanê îlmî, bi hawayêko muqayese/pêveronayışî tenzîm kerdo. Lehçeyê kurdkî; kirmancî û kurmanckî bi delîlanê îlmîyan a muqayese bîyê. Kitab de lehçeyê kirmancî û kurmanckî hetê fonetik, morfoloji û sentaksî ra ameyê analîzkerdene û peynîya kitabî de yew encam ameyo meydan. Nê encamî de Malmisanijî goreyê hîsanê xo hereket nêkerdo. Çunke heme çî bi tablo û istatîstîkan ameyo hesabkerdiş, goreyê istatîstîkan doneyî vejîyayê meydan û nê doneyan encamêk veto meydan. Kitab hetê tabloyan ra zaf dewlemend o. Hema-hema seba her mijarî tabloyî amade bîyê; kirmancî û kurmanckî bi tercumeyê tirkî ya deyayo. No seba wendozan -wendoxê ke perwerdeyê xo bi Tirkî dîyo- fehmkerdiş zaf asan keno. Ziwanê kitabî tirkî yo. No zî hetê Malmisanijî ra bizanayîş a ameyo tercîhkerdiş û bi eynî çî ya têkildar o. Çunke nuştox qayîl o ke kitabê ey bireso girseyêkê girdî û zaf merdimî kitabî ra istifade biko.

Malmisanij 1952 de yew dewa Pîranî de maya xo ra bî. Wendişê xoyo verên û mîyanên Kurdîstan de, unîversîte Anqara de qedêna. Dima ey heşt serrî mamostayîye kerda. Serra 1982 de welat ra vejîyayo. Unîversîteya Sorbonne (Parîs) û Unîversîteya Uppsala (Swêd) de qismê ziwananê ïranî wendo. Unîversîteya Linköpingî de qismê perwerdeyî de wendo. Swêd de Unîversîteya Goteborgî de masterê xo temam kerdo. Malmisanij hîna zaf bi lehçeya kirmancî û tirkî nuseno. Ehmedê Xasî û Usman Efendîyê Babijî ra dima heta serra 1970 welat de kirmancî nênuşîyabî. Malmisanij keso tewr verên o ke serranê 1970 de welat de kirmancî nuşto. Ey û tayê embazanê xo 1979-1980 de Tirkîya de kovara *Tîrêje* vete. Nêmeyê na kovare kirmancî nêmeyê aye zî kurmanckî (kirdaskî) bî. Ferhengê verênê kirmancî Malmisanijî amade kerdo û serra 1987 de neşr kerdo. Ey fariskî û tirkî ra tayê hîkayeyî zî tercumeyê kirmancî kerdî. Reya verêne ey Mewlidê Ehmedê Xasî û Usman Efendîyê Babijî herfanê erebkî ra çarnayê herfanê lafînkî ser û nê her di şâîrê kirmancan ma rê dayê naskerdene. Heta ewro nêzdîyê pîncas rojname û kovaran de, bi seyan nuşteyê Malmisanijî vejîyayê. Ey nê kovaran de redaktoriye kerde: *Tîrêj* (Îzmîr), *Hêvî* (Parîs), *Armanç* (Stockholm), *Çarçira* (Stockholm), *Wan* (Stockholm), *Cîra* (Stockholm). O demêk Swêd de serekê Komeleya Nuştoxanê Kurdan bi. Tayê kitabê ey tercumeyê îngilizkî, erebkî, kurdkîya başûrî (soranî) û kurmanckî; tayê şîirê ey zî tercumeyê îngilizkî, franskî û swêdkî bîyê. (zazaki.net)

Kitab eslê xo de hîrê beşan ra ware ameyo. Beşê yewin fonolojî ser o yo. Ma zanê ke fonoloji ser o yewna kitabê Malmisanijî, bi nameyê "Kürtçede Ses Değişimi" esto. Malmisanijî nê kitabê xo de fonetikê kurdkî ser o dergûdila izahat dayo. Nê beşî de Malmisanij behsê alfabeyanê kirmancî keno û alfabeaya xo ra behs keno ke Malmisanij bi xo alfabeaya Celadet Alî Bedirxanî şuxulneno. Ma zanê ke seba kirmancî alfabeleye cîya-cîya yî yenê şuxulnayene. Malmisanij ney ser o munaqeşe keno û alfabe de herf zêdekerdişî rê itîraz keno. Malmisanij fîkrê xo wina ifade keno: "Yew ziwan de her vengî bi yew herf a ifade

kerdene û seba her fekî alfabetê cîya viraştene hewce nêkeno. Vengê ke alfabe de ca bigirê ganî umûmî bê. Her ziwan de no tewir nuansî estê labelê nê alfabe de ca nêgînê. Na rewşê seba heme ziwanan eynî ya” (Malmîsanij 2015: 28-29). Tayê nuştoxî derheqê şuxulnayışê herfa “g” de zaf munaqeşe kenê. Malmîsanijî seba na herfe iştatîstîkêk viraşto û nê doneyî vistê xo dest: “ Goreyê di metnê ke ma tedqîq kerdî, mîyanê 15833 herfan de tena 22 hebî herfi “g” yê. Yanî nê metnan de nîsbetê herfa “g” % 0,13 yo. Heta na herfe heme ca de bi eynî şekl a nîyena telefuz kerdene.”(Malmîsanij 2015: 30). Malmîsanij mabênen kîrmancîkî û kurmanckî de vurîyayışê vengan bi nimûne û bi tabloyan mojeno. Kîrmancîkî tena bi kurmanckî ya muqayese nêkeno, kîrmancîkî xo mîyan de zî muqayese keno û cîyayîyan tesbît keno (Malmîsanij 2015: 36).

Beşê dîyin de nuştox morfolojîyê kîrmancîkî û kurmanckî ser o bi hawayêko muqayeseyî vindeno. Tîya de taye xususîyetê estê ke ma nînan sewbîna kitabanê gramerî de nîvînenê. Malmîsanij xususen nê beşî de etîmolojîyê çekuyan ser o melumat dano (Malmîsanij 2015: 48,50,89). Reyna Malmîsanij hakimê lehçeyanê kurdkî yo. Aye ra, gama ke delîl ano, sorankî, gorankî, kurmanckî ra şîre û nesran ra delîl ano (Malmîsanij 2015: 182-183). Malmîsanijî semedê meseleyanê zehmetan xeylêk îzahatê eşkera û sadeyî kerdê. No zî goreyê ma qîymetê kitabî zêdneno. Kitab de çekuyî, nameyî, zemîrî, sifetî, bestoxî, edatî, zerfî, interjeksîyonî û karî bi sîstemêk a rêze bîyê. Goreyê ma, tîya de zî neweyîyêk esta. Çunke seba kîrmancîkî babeta tewr aloze û zehmete, karî û antişê karan o. Sewbîna mijaran de pêşnîyazê Grûba Xebate ya Vateyî estê labelê kar û antişê karan ser o hîna konsensus nîviraziyayo. Seba aye ra no kitab de hîrê paran ra parêke seba babeta karan û antişê karan abîriyaya. Yanî heme hetê karan bi şeklêko sîtematîk û îlmî ameyê îzahkerdene.

Beşê hîrêyin derheqê sentaksî de ameyo nuştene. Ganî ma îfade bikîn ke no beşêko kilm o. Werrekna no beş hîna derg bîyayê. Çunke zafaneyê nuştoxanê kîrmancîkî perwerdeyê xo bi ziwanê tirkî dîyo û goreyê sentaksê tirkî fikirênenê, goreyê ney cumleyanê xo rêze kenê. Labelê tirkî û kurdkî yew malbata ziwanî ra nîyê û nê ziwanî merdimê yewbînan nîyê. Seba naye ra, sentaksê nînan zî sey pê nîyo. O semed ra ganî no beş hîna derg bîyêne. Çunke goreyê ma, mîyanê kîrmancan de merdimo ke tewr baş bi kîrmancîkî fikirêno û ney bi kîrmancîkî îfade keno Malmîsanij o. O semed ra kitab de ganî nimûneyê rêzebîyayışê cumleyan hîna zêde bîyêne.

Tewr peynîya kitabî de beşê encamî esto. Nê beşî de kîrmancîkî û kurmanckî goreyê doneyan muqayese benê. Malmîsanij, goreyê awanîya ziwanî, bi delîlanê xo îspat keno ke kîrmancîkî û kurmanckî çend nêzdîyê yewbînî yê û lehçeye kurdkî yê. Serra 1838 de Ferdinand Johann Wiedeman (1805-1887) malbata ziwananê Ural-Altay ser o xebîtiyayo û xususîyetê hemparê nê ziwanan tesbît kerdê. Malmîsanijî zî xususîyetê hemparê kîrmancîkî û kurmanckî tesbît kerdê. Xebata Malmîsanijî muhîm a çunke heta nika gramerzan tena fîkrê xo yê şexsî îfade kerdê. Labelê êdî destê ma de melumatê îlmî estê. Malmîsanijî nê melumatî kitabê xo de îfade kerde.

Kitab seba cigêrayoxan, nuştoxan, wendekaran û eleqedaranê kîrmancîkî ameyo nuştene. Pêşkêşîya kitabî de Malmîsanij kitabê xo wendekaranê xo rê dîyarî keno. No ma rê îşaretêk dano ke Malmîsanij qayîl o ke kitab girseyê xo bivîno û no girse kitabî ra iştîfade biko. Wendekarê ey, tena wendekarê lîsansî yan zî masterî nîyê. Her nuştox û wendekarê kîrmancîkî ganî kitabî ra iştîfade bikero. Yanî no kitab seba kurdan hemîne amade bîyo. No

semed ra kitabî mîsyonêko gird girewto xo ser. Seke Malmîsanijî ûfade kerdo: "Kitabê gramerê kîrmancîkî yê ke heta nika nusîyayê, zafane yan fekê mintiqayêk ser o yan zî fekê dewêk ser o nusîyayê. Nê tewir xebatî seba tesbîkerdişê cîyayîya kîrmancîkî baş ê labelê gramer ganî bi yew lehçe û bi yew mintiqâ û dewe ya sînorkerde nêmano." (Malmîsanij 2015: 18).

Bîbloyografiya kitabî ra fehm beno ke Malmîsanijî zaf çimeyan ra ûstîfade kerdo. Çimeyê kitabî bi îngilîzkî, almankî, kurdkî (kîrmancî, kurmanckî, sorankî, gorankî) yê. No hal qîymetê kitabî zêdneno. Kitab de 230 hebî cêrenotî estê. Nê cêrenotan de agahdarîyê zaf balkêşî estê. Malmîsanijî nê cêrenotî ge-ge sey ferhengê etîmolojî xebitnayê. Çunke seba îspatkerdişê teze xo kokê çekuye rê işaret kerdene üsulêko îlmî yo. Vateyo verên di rîpelî yo û seba kîrmancîkî agahdarîyanê başan dano. Qapaxê kitabî zaf bêreng mendo. Werrekna hîna rengin bîyayê.



Osmanlı Belgelerinde Kürtleri Aramak

Mesut Arslan¹

Received: January 4, 2015 Accepted: January 26, 2015



Osmanlı Kürdistanı/Kurdistana Osmanî

Hazırlayan: Kürdoloji Çalışmaları Grubu

Proje Koordinasyonu: Serhat Bozkurt- Alişan Akpınar,
bgst Yayınları, İstanbul, 2011, 354 + 14 s.

ISBN: 978-975-6165-45-4

Kürtler, dört yüz yılı aşkın bir süre Osmanlı tebaasıydı. Bu uzun zaman zarfında Kürtler, Osmanlı nüfusunu oluşturan önemli bir unsur oldu; yurtları da Osmanlı'nın İran ve Rusya sınırlarını oluşturan önemli bir bölge haline geldi. Bu önemden ötürü Osmanlı arşiv ve kütüphanelerinde Kürtlerle ilgili pek çok belge bulunmaktadır. Bu bilgi ve belgeler meydana çıkarılıp araştırmacıların istifadesine sunuldukça Kürt tarihinin önemli bir evresini oluşturan "Osmanlı Devrinde Kürtler ve Kürdistan Tarihi" de aydınlatılmış olacaktır. Tanıtımını yapacağımız *Osmanlı Kürdistanı/Kurdistana Osmanî* kitabının amacı da tam olarak budur.

Recommended citation:

Arslan, M. (2016). Osmanlı belgelerinde Kürtleri aramak [Review of the book *Osmanlı Kürdistanı/Kurdistana Osmanî* by Kürdoloji Çalışmaları Grubu]. *International Journal of Kurdish Studies* 2 (1), pp. 109 – 111.

¹ Research Assistant, Dicle University, PhD Student, Kurdish Language and Culture, Diyarbakır, Turkey, E-mail: mesutserfiraz@gmail.com

Osmanlı Kürdistanı/Kurdistana Osmanî kitabı, eski adı “Osmanlı Kaynaklarında Kürtler Çalışma Grubu” olan Kurdoloji Çalışmaları Grubu tarafından hazırlandı ve grubun önceki iki kitabı *Emîr Bedirhan* ve *Hînkerê Zimanê Kurdi* gibi bgst Yayınları tarafından yayımlandı. Eser, grubun Kürt Tarihi Araştırmaları serisinin ilk kitabını oluşturmaktadır. Osmanlı arşivlerinin tarihî kaynaklarında Kürtlerle ilgili önemli bilgi ve belge bulunduğu ve bu belgeler ortaya çıkarılmadan Kürt tarihinin hakkıyla bilinemeyeceği iddiasıyla yola çıkan grup, bu çalışmada Kurdistan kavramının Osmanlı kaynaklarında nasıl kullanıldığını farklı örneklerle okuyucuya sunarak Cumhuriyetin ilanından bugüne kadar süregelen bir tartışmaya belgelerle katkı sunmaktadır.

Osmanlı Kürdistanı/Kurdistana Osmanî kitabı adı ve içeriğiyle iki dilli bir eserdir. Bunlar Türkçe ve Kürtçedir. Kurdoloji Çalışmaları Grubu, iki dilli hayatın gereğine, anadilde eğitimin Kürtler için önemine ve Kürtçenin bilim dili olmasına binaen böyle bir karar almıştır. Kitapta yer alan altı makalenin hepsi hem Türkçe hem de Kürtçe neşredilmiştir. Ayrıca kitabın sonuna Kürtlerle ilgili Osmanlı belgelerinden örnekler ve Kurdistan vilayetlerinin Osmanlıca orijinal haritaları eklenmiştir. Kitapta kullanılan Osmanlıca belgeler Latin harflerine aktarılmasının yanı sıra günümüz Türkçesine de çevrilmiş, böylece Osmanlıca bilmeyen okuyucular da belgelerin içeriğinden haberdar olabilmektedir.

Kitap, proje koordinatörlerinden Alişan Akpınar'ın önsözüyle başlıyor. Hemen ardından giriş makalesi olarak Namık Kemal Dinç'in “Kadim Anavatandan Bir İnkâr Coğrafyasına: Kurdistan” yazısına yer verilmektedir. Makale 1925'den önce gerek resmi gerek özel belgelerde serbestçe kullanılan Kurdistan kavramının nasıl yasaklandığını, kriminalize edildiğini örneklerle açıklamaktadır.

“Kurdistan Eyaletinin Kurulması ve Osmanlı Devlet Sâlnâmelerinde Kurdistan Eyaleti” makalesi iddia edilenin aksine Osmanlı Devletinde Kurdistan adıyla idarî bir birimin varlığını ispatlıyor ve bu idari birimin sınırlarını devlet salnameleri ve devletin resmî yayın organı *Takvim-i Vakayı* gazetesi şahitliğiyle gözler önüne sermektedir. Merkeziyetçilik fikrinin etkisiyle uzun isyan ve çatışmaların sonunda 1847 yılında kurulan Kurdistan Eyaleti, Kurdistan'da Yavuz Sultan Selim'den bu yana –yaklaşık 332 yıl- varlıklarını sürdürten Kürt miriliklerinin de sonunu haber vermektedir.

“Coğrafya-yı Osmanî’de Kürtler ve Kurdistan” adlı makale bize Kurdistan kavramının Osmanlı'da kullanımının ne kadar normal ve yaygın olduğunu göstermektedir. *Coğrafya-yı Osmanî*, askerî bir okulda coğrafya öğretmeni –aynı zamanda asker- olan Kolağası Ahmet Cemal tarafından idadi okullarının birinci sınıfında okutulmak üzere kaleme alınmış bir coğrafya ders kitabıdır. Kitapta “Kurdistan Kî‘asında Bulunan Vilâyât-ı Şâhâne” başlıklı bir bölüm vardır ve burada Osmanlı Kurdishanı'nın vilayetleri hakkında bilgi verilmektedir. Kitaba göre Osmanlı Kurdishanı altı vilayet ve bir müstakil sancaktan oluşmaktadır. Bunlar: Erzurum, Mamuretülaziz, Diyarbekir, Bitlis, Van, Musul vilayetleri ve müstakil Zor sancağıdır. Bugün için resmî mercilerce basılan bir kitapta Kurdistan coğrafyasına yer verilmesi ve bunun öğrencilere ders olarak okutulması bize imkânsız gibi gelebilir ancak 1895 yılında durum tam olarak böyledir.

“Lugât-ı Tarihiyye ve Coğrafiyye’de Kürtler ve Kurdistan” yazısı Ahmet Rifat tarafından hazırlanıp 1881-1882 yılları arasında yayımlanan 7 ciltlik *Lugât-ı Tarihiyye* ve

Coğrafîye adlı ansiklopedide yer alan başta Kurd ve Kurdistan olmak üzere Kürtlerle ilgili tüm maddelerin Latin harflerine aktarılmasından oluşmaktadır.

“Kurdistan Malumatı” adlı makalede 1895 yılında kadı naibi Ahmed Fazıl tarafından Hamidiye Alaylarının teşkilatlanmasında ve II. Abdülhamid'in doğu siyasetinde önemli bir role sahip olan Müşir Şakir Paşa'ya sunulmak üzere hazırlanan bir rapor ele alınmıştır. Kürtleri tanıtmak amacıyla hazırladığı anlaşılan rapor, günümüze kadar sürecek olan Kürt sorunu üzerine rapor yazma geleneğinin ilk örneklerinden olması bakımından da önemlidir.

Osmanlı-Kurt ilişkilerinde dönüm noktası olan olayların başında Çaldırın Savaşı gelir. Bu savaş sonucunda elde ettiği zaferle en büyük rakibi Safevi Devleti'ne karşı üstünlük elde eden Osmanlı, İdris-i Bitlisî aracılığıyla irtibata geçtiği Kurt mirleriyle ittifak kurarak Kurdistan coğrafyasını sınırlarına katar. “Tarih-i Ebu'l-Faruk'ta Kurdistan'ın Fethi” adlı makalede bu süreç son dönem Osmanlı tarihçisi ve aydını Mehmed Murad'ın ya da meşhur adıyla Mizancı Murad'ın kaleminden anlatılmaktadır.